

Şêrê Girê Şêra:

*'Sêzdeh beval bûn ji
hev re rast bûn'*

Şêrê Girê Şêra yek ji girîngtirîn şêrên têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê ye lewre cara yekemîn serhildanan piştî vî şerî rû daye. Ji ber vê yekê strana "Heval Kamûran" li ser vê bûyerê hatiye gotin û gelekî jî bi nav û deng e. Li aliyê din şehadeta 13 gerîlayan jî daxbar û trajîk e. Gerîla jî aliyê malbateke ku demeke dirêj li mala wan dimînin, tên jehrkirin. Piştî vê artêşa tirk bi hezaran leşkeran diavêje ser gerîlayan. (Şehîd: R-6)

Nivîskar Zerdeşt Haco:


**Di
warê
zimên
de
pêşveçûnên
mezin
hene**



Hevpeyvîna bi Zerdeşt Haco re:

R.8-9

Azadiya WELAT



E-Mail: s.berbang.usa.net

SAMİ TAN

PKK tu car naxwaze ku NATO li ser navê rizgarkirina gelê kurd gelê tirk bombebaran bike. Ji ber vê yekê, împeryalîst piştewaniya dagirkeran dikin.

Bombeyê NATO'yê kê rizgar dikin?

Hêzên împeryalîst Yugoslavyayê bombebaran dikin. Dagirkerên welatê me, bûne serxwebûnawaz, dixwazin bi destê împeryalîstan gelê Kosowayê ji tevkujiyê rizgar bikin. Lewre jî doza tevgera bejî dikin. Ji bo vê yekê mehmetchik hatine amadekirin. Faşîstên tirk bo hêzên NATO'yê, li çepikan didin. Lê gelê Kosowayê ji tevkujiyê rizgar nabe, bi hezaran kes ji welatê xwe direvin. Kes napirse ka çi bi Yugoslavyayê hat, ew gelên ku bi salan digel hev dijiyan, çima ketine paxila hev? Împeryalîst planên xwe digerin, di plana wan de parastina yekparetiya Tirkiyeyê û parçekirina Yugoslavyayê heye.

Lewre jî dewleta tirk doza serxwebûna Kosowayê dike. Hinek rayedarên dewleta tirk ji niha ve dibêjin 'êdî ne gengaz e ku sirb û arawûd digel hev bijîn, serxwebûna Kosowayê pêwîst e.' Lê dîsa jî dilê dagirkeran ne rihet e. Ev gotina rayedarekî rûsî a bi rengê "Kesê ku qesra wî ji camê be, divê qesra yekî

din kevir neke" tînin bîra xwe û doza parastina yekparetiya erdê Yugoslavyayê dikin. Ji niha ve hinek dewletên mîna Yewnanîstan û Îtalyayê bi daxuyaniyên xwe didin zanîn ku qesra dewleta tirk jî ji camê ye û dixwazin ku hêzên NATO'yê ji bo rizgariya kurdan Tirkiyeyê bombebaran bikin. Li ser van daxuyaniyan Demirelê ku berî çendekê gotibû: "Heke Ewropa zorê bide me, da ku em kurdan wekî kêmnetewe bipejirînin, wê paqijiyê etnik jî were rojevê.", dîsa daxuyaniyê şayanî devê xwe da: "Tirkiye ne Yugoslavya ye."

NATO'ya rizgarker (!) li Kurdistanê bi karekî din re mijûl dibe. Paqijiyê etnik ku ji mîj ve li ser kurdan tê meşandin, bi piştewanî û çekên NATO'yê tê meşandin. Panzerên alman zarokên kurdan dipelixin, skorskyên DYA'yê wekî teyrên leşxur li ser serê gundiyan kurd digerin.

Komploya NATO'yê li ser kurdan jî li dar e. Serokê Giştî yê PKK'ê

Abdullah Öcalan bi destê sîxurên Amerîka û Îsraîlê dîl hate girtin. Hate gotin ku ji ber gefên hikûmeta îngiliz, Afrîkaya Başûr mafê penaberiyê nedaye Öcalan. Tekane televîzyona kurdan MED-TV bi destê dewletên endamê NATO'yê hate girtin.

Durûti li ber çavan e. Tevî hemû vir û derewên çapemeniya tirk jî, her kes pê dizane ku li dijî kurdan rewşa Tirkiyeyê dişibe rewşa sirban a li hemberî Kosowayê. Daxwazên UÇK û PKK'ê nêzî hev in.

Bi tenê cudatîyek heye; PKK xwe wekî tevgera azadiya mirovahiye dibîne û xwediyê bîr û baweriyêke sosyalîst e. Her wiha PKK tu car naxwaze ku NATO li ser navê rizgarkirina gelê kurd, gelê tirk bombebaran bike. Lewre jî, tevî ku Sedam bi hezaran kurd kuştine jî, ew li dijî bombebaran kirina gelê Iraqê ye.

Ji ber vê baweriyê PKK'ê, NATO piştewaniya hêzên dagirker dikin. Lê gelê me sedema vê durûtiya wan baş dizane û dê dek û dolabên wan bi avê de bibe.

Li hemberî kurdan helwesta sendîkayan

Ferhengok

adan: bijûn, bi bereket
asêgeh: kale, hisar
bahor: meltem
baranên çil esrîn: kirk
ikindi yağmurları
bêhempa: yekta
berate: leş
bişkvîn: filizlenme
cankuçik: kesê ku li
ber canê xwe nakeve
çêjandin: tamkirin
daxbar: xembar
derben: askî
dîlse: dilkoçer (şipsevdi)
dirinde: hov, weş
dozîn: güdü
erk: rol, dewr
fişargo: gotinên eletewş
ên tagirtinê, pesta gotin
(sayıklama)
gobilîn: esinti
hîlbezîn: qevaztin
kapan: kolanên teng
kelepor: jêma, mîras
lêrahatin: bağışıklık
kazanma
masûlke: kas

miçûlgevan: lades tutan
par: vücudun arka
tarafı
pêr: vücudun ön tarafı
pesta gotin: sayıklama
ravekirin: izahkirin
rêje: oran
rikdar: kindar
sekan: kayak küreği
serjimar: nifûs
serperî: deniz kıızı
serperîştî: rêveberî
silûçk: tûma gû ya
biçûk
sofîn/e: zeviya kulilkan
takekes: ferd
têkçûn: yenilgi, dağılma
tiliya babelîçk: yüzük
parmağı
tiliya qılıçk: serçe
parmağı
wêjekar: edebiyatçı
welê: wisa, wilo
xetere: talûke
xunivîn: çiselemek
zertav: şevceq

HÜSEYİN DENİZ

Ji pêleyekê vir de tirs û sawa ku ji ber teqînên molotofî yên ku li bajarên mezin pêk tîn, didome. Ev rewş, di encama molotofên ku li Mavi Çarşiyê hatin werkirin de hate pê. Li darî çavan e ku agir û rivîna şerê li bajarên kurdan didome, dê bajarên rojavayê jî rapêçe. Rûdana dawîn jî wekî yên din beramberî nixandînen pêxasiyane û çêrane ma. DİSK'ê jî bi daxuyaniyekê diyar kir ku wê ji bo şermezarkirin û hişyarkirinê biryara çalakiyekê girtiye.

Sekreterê Giştî yê DİSK'ê Murat Tokmak daxuyand ku dê li dijî "çalakiyên terorîstî yên ku li van rojên dawîn gur dibin" çalakiya hişyarkirinê li dar bixin û dê tevaya sendîkayên ku girêdayî DİSK'ê ne tevî bibin. Ev daxuyani balkêş e.

DİSK'ê digel biryara Lijneya Giştî jî li dijî şerê ku ev deh sal in didome tu gav neavêtiye lê li dijî bûyerên vê dawiyê ku ji ber şer diqewimin, nerazîbûnê nîşan dide. Divê mirov li vê bertekê baş bikole. Gelo mirov vê helwestê ku li gorî berjewendiyên çinayetiya bindestan

binirxîne, ji wê dipê? Ger li gorî berjewendiyên çinayetiye bê mêzêkirin, divê DİSK'ê bo qedandina şer gelek çalakî li dar bixistana. Lewre şerê ku ev 15 sal in didome sedema bingeşîn a mercên xerab ên çîna bindest e, ne ku molotofên ku vê dawiyê diteqin.

Ev yek ne tenê li dijî helwesta çî-

DİSK'ê digel biryara Lijneya Giştî jî li dijî şerê ku ev deh sal in didome tu gav neavêtiye lê li dijî bûyerên vê dawiyê ku ji ber şer diqewimin, nerazîbûnê nîşan dide.

nayetî ye, her wiha li dijî dîtina bingeşîn a rapora xebatê ya Lijneya Giştî ye. Wekî tê zanîn di raporê de dîtineke wiha derketibû holê: "Îro ji bo çareserkirina Kêşeya Kurdî dewlet berpîrs e. Divê bê dîtîna ku pest û pêkûfî meseleyê çareser nakin. Ji bo bi awayekî mayende û aştiyane çareserkirina Kêşeya Kurdî pêvajoyeke demokratîk divê."

Rewşa sendîkayên din jî ji DİSK'ê cuda nîn e. Alîkariyên ku di 94'an de bo Veqfa Mehmetçik hatine kirin, piştigiriya îlanê ya bo

Veli Küçükê ku di rapora Susurlukê de cih digire û di Kêşeya Kurdî de xwedî rîstêke kirêt e; piştigiriya bo van pîrozbahiyên a sendîkayên ku bi belengazî û ji kar avêtinê re rû bi rû ne û ji mafê xwe yê birêxistîrbûnê bêpar in, piştî çûyina Îtalyayê ya Serokê PKK'ê piştigiriya daxwaza dewletê ya îadekirin û darvekirinê, teşwîqkirina rûdanên lîncîkirinê (daxuyani, xwepêşandan hwd.), daxuyani û îxbaren nijadperest ên sendîkaya bi navê Türk KamuSen! ê ku KESK'ê wekî hedef nîşan dide hwd. rewşa wan baş darî çavan dike. Peyre daxuyaniyên bi mebesta redkirina kurdan hatine amadekirin, di rojnâmeyan Almaniyayê û Îtalyayê de hatin weşandin.

Li aliyê din piştî ku Kenyayê bi fermana Amerîkayê Öcalan radesfî dewleta tirk kir (êdî dewlet jî qebûl dike), gir û rikeke şoven dest pê kir. DİSK, Türklş û Haklş'ê bi daxuyaniyên xwe piştewaniya vê yekê kir.

Bi mînakên navborî jî darî çavan dibe ku, li hemberî şer û şovenîzmê li cem kedkaran ref nagire, li cem berjewendiyên dewletê ref digire. Di encamê de "sendîkayan ligel sermayeyê li dijî kedê ref girtin."

AGAHDARÎ

Ji kerema xwe re nameyên xwe bişnin vê navnîşanê.


İstiklal Cad. Ayhan. Işık sokak. 23/3
BEYOĞLU / İSTANBUL

Greva birçîbûnê piştî 46 rojan qediya

Bêdengiyê dîlekî şer

kuşt

Bêdengiya raya giştî ya li hemberî greva birçîbûnê ya dîlên şer bû sedema mirina girtiyekî. Wekî encama vê bêdengiyê hefteya çûyî li Girtîgeha Dilûkê girtiyê bi navê Çetin Güneş jiyana xwe ji dest da. Li aliyê din dîlên şer bêdengiya saziyên demokratîk protesto kir.



Sinan Cemgil

Komploya navneteweyî ya ku bi dîlketina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan encam da, ji hêla girtiyên ji doza PKK'ê ve bi greva birçîbûnê û rojiya mirinê hate protestokirin. Li girtîgehên cur bi cur bi dehan girtî ji 16'ê reşemiyê heta 1'ê avrêlê di greva birçîbûnê ya bînavber û rojiya mirinê de man.

Roja 1'ê avrêlê grevên birçîbûnê û rojiyên mirinê bi daxuyaniyekê hate kutakirin. Di daxuyaniya ku li ser navê Yaşar Çelik hatiye dayin wiha hate gotin ku ji ber ku çalakî gihîştîye armanca xwe dawî li çalakîyê hatiye.

Li gorî agahiyên ku bi dest ketine, digel bi hezaran kesên di grevên birçîbûnê yê dorvegerî (dönüşümlü) de, li dora 150 kesî ketibûn greva birçîbûnê ya bînavber û rojiya mirinê, hejmara kesên beşdarî çalakiya ku roja 1'ê avrêla kuta bû wisa bû:

Hejmara kesên ku ketibûn rojiya mirinê:

Girtîgeha Sêwazê: 112 girtiyên jin

Girtîgeha Orduyê: 4 kes

Girtîgeha Sêrtê: 12 kes

Girtîgeha Mûşê: 8 kes

Girtîgeha Dilûkê: 15 kes

Hejmara kesên ku ketibûn greva birçîbûnê ya bînavber

Girtîgeha Bayrampaşa: 28 girtî

Girtîgeha Burdurê: 20 girtî

Girtîgeha Amasyayê: 32 girtî



Girtîgeha Ceyhanê: 20 kes

Girtîgeha Çankırıyê: 10 kes

Girtîgeha Naziliyê: 20 kes

Ji ber bêdengiya raya giştî ya li hemberî vê çalakîyê, hefteya çûyî li Girtîgeha Dilûkê girtiyê bi navê Çetin Güneş jiyana xwe ji dest da. Güneş ji ber nivîseke ku di kovara Alternatifê de nivîsîbû bi 16 mehan hatibû cezakirin û li girtîgehê bi nexweşiyê giran ketibû. Piştî ku ji bo protestokirina komploya li ser Öcalan dest bi greva birçîbûnê kiribû, rewşa wî ya tenduristî xerabtir bûbû û ew rakiribûn Nexweşxaneyê Nimûne ya Enqereyê.

Girtiyên şer ev helwesta raya giştî ya demokratîk bi daxuyaniyekê protesto kir. Li gorî daxuyaniya girtiyên ev helwesta kes û saziyên demokratîk "tercîheke siyasî" ye. Hate gotin ku sedema vê bêdengiyê daxwaza girtiyên e. Lewre îcar girtî bi daxwazêke polîtîk derketine holê û xwedî li Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan derketine, ev yek jî dike ku ev sazî xwe ji çalakîyê dûr bigirin û li girtiyên xwedî dernekevin. Di daxuyaniyê de dihat bi bîr xistin ku tu partî û saziyên demokratîk li rewşa girtiyên daxuyaniyek jî nedaye û bi vê yekê jî xwestine xwe ji êrîşên şovênistan rizgar bikin.

Rojnameya Özgür Politika roja 1'ê avrêlê li ser rewşa dîlên şer nûçeyek amade kir. Li gorî vê nûçeyê tu saziyên

çepgir û demokratîk li ser rewşa girtina daxuyaniyek jî nedaye. Di nûçeyên ji partiyên mîna HADEP, EMEP, ÖDP û ji İHD'yê daxuyaniya wan a li ser van çalakiyan hatiye xwestin, lê giştî ji gotiye tu daxuyaniya me li ser van çalakiyan nîn e.

Piştî vê nûçeyê, li ser navê Platforma Rêxistinên Bakurê Kurdistanê Abdurrahman Çadircı jî daxuyaniyek li ser rewşa girtiyên ragihand û xwest ku dawî li vê bêdengiyê bê. Çadircı wiha got: "Em çalakî û rojiya mirinê ya ku dîlên şer ên PKK'yî û girtiyên şoresger ên ji rêxistinên Tirkîyeyê silav dîkin. Çetin Güneş bi tenê mînakek e, dibe ku gelek girtiyên din jî şehîd bikevin, lewre jî divê di zûtîrîn katê raya giştî li wan xwedî derkeve. Li hemberî van çalakiyan sersariyêke mezin heye. Divê dewleta tirk daxwazên girtiyên bipejirîne. Saziyên mafên mirovan, dewlet û saziyên navneteweyî divê li hemberî vê rewşê bêdeng nemînin."

Her wiha Federasyona Komeleyên Kurd li Almaniyê (YEK-KOM) jî bang li hemû komeleyên xwe kir, da ku ji bo belavkirina deng û daxwazên girtiyên şer çalakiyan li dar bixin.

Hate xwestin ku endamên komeleyan çalakîyên girseyî li dar bixin û daxuyaniyên li ser rewşa girtiyên û daxwazên wan bigihînin saziyên navneteweyî.

NAVENDA NÛÇEYAN

Kurtenûçe

LI TAKSÎMÊ ÇALAKIYA FEDAYÎ

Roja 27'ê adarê li Qada Taksîmê gerîlayeke jin li ser koma polîsan çalakiyêke fedayî pêk anî. Li gorî agahiyên gerîlayê xwestiyê çalakiyê di nav koma polîsan de pêk bîne, lê polîsekî ew daye rawestandî, li ser vê yekê wê jî bombe di bedena xwe de teqandiye. Bi vê yekê re wê jiyana xwe ji dest daye û 3 heb jê polîs 10 kes jî birîndar bûne. ARGK'ê li ser çalakiyê daxuyaniyek belav kir û berpirsiya çalakiyê girte ser xwe. Li aliyê din çavkaniyên ARGK'ê diyar kir ku roja 25'ê adarê erebeyêke leşkerî ya artêşa tirk li Qilabanê li ser riya Xabûr û Qaşûrê li mayina gerîlayan qelibiyê û erebe rûxiyaye, 18 leşker jî hatine kuştin.

TÛRÎZMA TIRKIYAYÊ ŞIKESTEK XWAR

Piştî çalakiyên bo piştevaniya Öcalan û daxuyaniya ARGK'ê ya ku hemû Tirkîyeyê wekî qada şer diyar kir, tûrîzma tirkî şikesteke mezin xwar. Li gorî nûçeyên ku bi dest ketine bi tenê li Almaniyê % 80'yê şirketan rezervasyonên xwe yê li Tirkîyeyê betal kirine. Li dûv daxuyaniya hişyarîyê ya ARGK'ê gelek dewletan bang li hemwelatîyên xwe kiribû, da ku neçin Tirkîyeyê. Her wiha banga ARGK'ê û rewşa tûrîzma tirk di çapemeniya cihanê de jî bi berfirehî cih girtibû.

LI MÊRSÎNÊ POLÎSAN AVÊT SER A. WELAT

Hêzên dewleta tirk şeva 26'ê adarê avêt ser mala Nûnerê Azadiya Welat ê Mêrsîn Ferhat Kandal û ew digel mêvanên wî girte binçav. Di heman saetê de hinek polîsan jî avêt ser mala xebatkarê rojnameyê Ekrem Hazar ew jî hate binçavkirin. Herwîa roja 27'ê adarê saet li derdora 11.30'an jî hêzên dewleta tirk îcar avêt ser nûnergeha rojnameyê ya Mêrsînê û hemû hate tevlihevkerin, berkêşka maseyê ya kiltîkîrî hate şikêndin û wênayên bi dîwaran ve hatin çirandin. Polîsan piştî vê yekê xebatkarê rojnameyê Vedat Yaman jî girte binçav. Xebatkarên rojnameyê yê nûnergeha Mêrsînê dema ev nûçe hate amadekirin, hê jî di binçav de bûn.

Ji çend hêlan ve herêma Botan (2)

Herêma Botan; ji bakur ji Çemê Botan ku di navbera Sêrt û Dihê (Eruh) de ye, dest pê dike. Dih, Şirnex, Cizîr, Silopî (Girikê Amo), Basa (Güçlükönak), Şax (Çatak), Çolemêrg, Gever, Şemzînan, Xezxêr (Perwarî), aliyekî Qilabanê (Uludere)ê di nava xwe de dihewîne. Li hêla din deverên wekî Çirav, Gabar, Cûdî û Herkolê jî di nava sînorên Herêma Botan de ne. Vê gavê em yek bi yek van deveran raxin ber çavan.

Gebar

Gabar; navenda Botan e. Hem herêm e, hem jî çiyayeke gelekî berz û fireh e. Dar û daristan lê gelek zêde ne. Warê çend kanî û avên herikbar e. Ji hêla têkoşîna rizgariyê ve gelekî stratejîk û girîng e. Mintiqeyên "Çiyayê Dêrşew", "Deşta Lela" bi nav û deng in. Bi qasî 2530 gund di nav van herêmên biçûk de cih digirin. "Çiyayê Bizina" ku jê re Çiyayê Dêrê jî tê gotin li vê deverê ye. Ji ber ku derdora vî çiyayî gundên suryaniyan hebûne, ev nav li van çiyayan hatiye kirin. "Dêrşaw û Deştelani" her wiha navên du eşîrên mezin ên Herêma Botan in, di nav sînorên Gabarê de jiyana xwe didomînin. Gabar cih û warê şervanên azadiyê ye. Fermandarê Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê Egît (Mehsum Korkmaz) li vê derê ketiye nav refên pakrewanan.

Cûdî

Ji Şirnex, Cizîr û Silopiyê pêk tê. Cih û warê eşîra Batuyan e ku piraniya wan "Cehş" in. Serekcehş û Serekeşîr Osman Demir xiyaneta xwe li vê herêmê bi salan e didomîne. Li aliyê din herçiqas eşîrên xayîn wekî; Mala Elîxan Tatar, li Cizîrê Eşîra Teya, li Silopiyê jî Mala Hecî Hemo ku ew jî Serekcehş û Serekeşîr e jî; Herêma Cûdî bi gelemperî bi welatparêziya xwe tê nasîn. Besta jî li herêmê pir girîng û stratejîk e.

Ji layê cografî ve Çiyayê Cûdî û derdora wî gelek berz û bilind e. Cih û warê keştiya Nûh Pêxember e. Rijiyeye xas jî vê deverê derdikeve.

Herekol

Navenda vê herêmê navçeya Xezxêr e. Zozan e, zivistanan jî sir û seqem e, bilind û dijwar e. "Deşta Rawa", "Çemê Karê", "Çemê Hêlêz", "Meydana Silêmana" di nav Herêma Herekolê de bi nav û deng in. Bi qasî 20 gund di qûntara Çiyayê Herekolê de ne. "Eşîra Şekirîya" xwediyê 15 gund û 100-150 cehşî ye. Ev eşîr li ber têkoşîna gelê kurd jî mêj ve asteng e.



Çirav

Navçeya Dihê (Eruh) ku bi ser bajarê Sêrtê ve ye navenda Herêma Çiravê ye. Bi qasî 70-80 gund li herêmê hene. Bi tenê 8 gund bûne cerdevan ku li van gundan tabûrên leşkerî hene. Gundên mayî an şewitîne an jî ji hêla dewletê ve hatine xirakirin. Bi navê "Mişarê" mintiqeyeke girîng heye ku jî 15 gundan pêk tê. Zivistanê bi berf û baran e. Ji hêla daristanan ve qels û lawaz e; ji hêla kevir û tehtan ve dewlemend e. "Çemê Sor" jî Çiravê di navbera gundên Bikat (Dadaklı) û Nîte (Dönerdöven) dizê, di ser Basayê re digihêje Çemê Botan. Li derdora Mişarê "Çiyayê Reş" û "Çiyayê Şêx Emer" jî hene.

Çend cûre xwarin ji Herêma Botan

Şamborek: Ji hûrika savarê çêdibe. Ji nebatên wekî goşt, pîvaz, bacanê sor û jî kunciyên tê çêkin. Nava hêvîr tê dagirtin û di nava avê de tê kelandin.

Gebol: Ava tîrî tê kelandin, sîsikên tîrî jê tene avêtin, ava safî ya tîrî datînin ser êgir heta dikele. Piştê arvan berdidin ser û tev didin heta ku av tîr dibe û tim ev lihevda didome. Ji gebolê helîl û bastîq çêdibe.

Danexav (Şişik): Gênim berdidin nava avê û şil dikin. Piştê dixine nava

coniyê û dikutin heta ku kelpik ji serî diçe, tê kutandin. Piştê bi destan an jî bi aş dihêrin. Wekî savarê tê kelandin. Piştî kelandinê, dew an jî rûn berdidin nav.

Parev (Büryan): Xwarina navdar a Sêrt û Bedlîsê ye. Paryên goşt yê mezin tevî hestiyên bi serê bistikan ve datînin û davêjin firûnên ku 23 metro di bin erdê de ne. Goştê ku di firînê de hatiye ber jihevketin û peritîne, êdî ji xwarinê re amade ye.

Kutîlk: Ev xwarin cûreyeke şamborekê ye. Şamborek pehn e lê kutîlk gilover e. Hevîrê ku nava wî bi goşt, pîvaz û kunciyên hatiye dagirtin, di nava avê de tê kelandin.

Sîrika kiça: Sîrik cûreyeke giyayê ye. Li çiyê şîm dibe. Ev xwarin navê xwe ji eşîra "Kiça" ku li herêmên Cizîr û Hezêxê bi cih û war in, distîne. Di destpêkê de sîrika hûr bi xwê tê kesidandin, piştê penîrê hûr lê direşînin û tev didin. Dixin nava eyarê mihan. Bi wî awayî di nava rûne de tewa xwe digire.

Hewdal: Ji kelandina dims û arvanê çêdibe, rûn tevî wê dibe.

Hêkedims: Ji kelandina hêk, dims û rûn çêdibe.

Qawît: Ji genimê sorkirî yê hêrandî û dimsê çêdibe. Piştî kelandinê wekî savarê dirûv digire.

Mehîr: Ji dew û dan, ji dew û birinc, carna jî ji dew û gêris çêdibe. Piştî kelandinê dibe mehîr.

Şorbeşîr: Ji kelandina şîr û birincê çêdibe.

Merge: Ji kelandina goşt, av û pîvazê çêdibe.

Helîse: Ji nanê şikeva (Nanê netirşkirî) çêdibe. Goşt hûr hûr dikin, dikelfînin, piştê berdidin ser nanê şikeva. Bacanê sor li dorê direşînin.

Çortan: Ji jajî angû ji toraqê çêdibe. Jajî wekî gûlok gilover dikin, datînin ber tavê heta ku hişk dibe. Piştê dixin nava çewalan û hildidin. zivistanan berdidin nava ava ger û bi destan difirîkînin. Bi firikandinê, şiklê dew digire.

Hevrîşk: Nanê germ ku nû ji tenûrê an jî ji sêlê derketiye tê hûrkirin, piştê tevî rûn û ava bacanan (Salçe) tê sorkirin û tê xwarin. Carna jî ji bo çêkirina xwarina hevrîşkê, nanê tenûrê ku êdî kitût bûye angû ku êdî hişk bûye tê bikaranîn.

Mice: Ji goşt, şêlim, û danê tê çêkirin. Tê kelandin. Piştê rûn sor dikin û tevî salçe li ser direşînin.

Keşke: Ji dan û rûne çêdibe. Rûn tê sorkirin, li ser tê reşandin.

Dewin: Ji dan, dew, şêlim û pincarê tê çêkirin. Pêşî danê genimê tê kelandin, piştê pincar û şêlim dixin navê û dike-lînin.

Keledoş: Ji dan, kakilê gûzan, nîsk, goşt, rûn û salçe tê çêkirin.

Jêrenot: Ji bo amadekirin û berhev- kirina vê xebat û lêgerînê ji çend rîhs- piyên Botî sûd û fêde hatiye wergirtin.

BERHEVKAR: SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Di zimên de girîngiya biwêj û şayesana

Ji bo ku zimaneke rewan û pehtî bibe pêwîstî bi biwêj, şayesana (terkîb) xweserî wî zimani heye. Digel peyv û awayê hevoksaziyê yê zimaneke din biwêj û şayesana zimaneke serdestan jî zimaneke me ji binî ve dirûxin. Ev tişt rêz û rêçikên zimaneke me ji reseniyê dût dixin û rê li ber pişaftinê vedikin. Lewre di zimaneke de dema ev rêz û rêçik ji holê rabûn, ev ziman nikare xwe li ber bandora zimaneke din ragire. Awayê peyv û hevoksazkirinê û biwêj û kome-peyvên ku rewşekê rave dikin, zimaneke jî zimaneke din cuda dike. Belkî bala gelekên ji we kişandibe, bi taybetî kesên ku ji welêt dût ketine, bi domana demê re digel peyvên zimaneke biyan, di nava zimaneke kurdî de gotin û biwêjên zimaneke din jî bi kar tînin. Êdî rewşeke wisa derdikeve holê ku peyv bi kurdî bin jî mantiq ne bi kurdî ye. Lewre jî gel ji axaftina wan tiştêkî fêm nake.

Ev xetere li ber her zimani heye. Heta zimaneke welatên ewrûpî jî ji bo ku rê li ber vê yekê bigirin zagonan derdixin. Lewre gerdûnîbûna di warê aborî-siyasî de zimaneke jî nêzikî hev dike. Lê ji ber ku pergala li ser dubendî û neyeksaniyê a-va bûye, zimaneke heyî nêzikî hev nabin, zimaneke hêzên serdestan ên din dihelîne. Niha ev zimaneke DYA'yê îngilîzî ye. Îro qalib û şayesana zimaneke îngilîzî ketine her zimani, fransî jî bo ku vê bandorê bişikên zagonan derdixin. Rewşa alman û japonan kambaxtir e. Lê rewşa herî xerab rewşa zimaneke tirkî ye. Lewre tirkan di dest pê de lingê xwe li lingê ewrûpî-

Zimaneke tirkî her tim jî zimaneke din tişt wergirtine, di dema Osmanî û Selçûkiyan de bandora erebî û farisî, di heyama dawîn a osmaniyan de bandora fransî û niha jî bandora îngilîzî darî çavan e. Lê zimaneke kurdî xwediyê bingeheke xurt e û demeke dirêj wekî zimaneke gelê li çiya û zozanan jî bandora zimaneke biyan dût maye.

yan girtiye, lê ji ber ku ji aliyê aborî, siyasî û çandî ve ew qas bi pêş neketiye, bi awayekî lasayî xwestiyê bibe ewrûpî.

Dema mirov çavekî li tabelayên kargehên li derdora xwe bigerîne mirov dê rastî navekî tirkî neyê. Her wiha radyo, televîzyon û çapemeniya wan jî zimaneke sosret belav dike. Mirov dikare di bernameyên televîzyonên wan de rastî hevokê bi vî rengî bê: "Hey morik, şifayî kapmişsin, senin bi çekapa (check-up) istiyacin var." Lewre jî hinek derdorên kemalîst dixwazin ku zagonên parastina zimaneke derxin. Hikûmeta Ecevit di vî warî de jî gava yekemîn avêt. Lê wisa xuya ye ku dê tu kes guhê xwe nede zagonê.

Heke em vegezin ser rewşa kurdan, rewşa kurdan jî ji vî alî zêde baş xuya nake, lewre zimaneke kurdî hatiye ber-bendkirin, rê li ber bipêşketina wî hatiye girtin. Digel sînorên bi tîlên risayî, sînorên çandî jî di nava gelê me de pêk hatine. Di nava kurdiya her parçeyî de ji ber tîkiliyên bi dewletên serdest re hinek qalib û şayesana nû pêk hatine, her wiha gelek tîgîh û peyv jî bi riya zimaneke serdest

ketine nava zimaneke. Heta di kurdiya hinek herêman de zimaneke serdestan bandor li hevoksaziya kurdî jî kiriye. Bo nimûne di hevoksaziya kurmançiya Bakur de bandora tirkî di ya Başûrê Biçûk de bandora erebî û di ya Rojhilat de jî bandora farisî xwe dide der. Her wiha di kurmançiya kurdên Qafqasan de jî bandora zimaneke din ên wê herêma tê dîtin. Her çiqas zimaneke kurdî xwediyê bingeheke qewî be jî, bandora çanda serdestan xesareke mezin daye zimaneke me. Digel cudatiya di nava zaravayan de, di zaravayekî de jî li gorî herêman hinek cudatî pêk hatine. Dema mirov hevoksaziya kurdên Behdînan û kurdên Qafqasyayê bide ber hev, dê cudatî bi awayekî zelal bê dîtin, her wiha kurmançiya Afrîn û Wirmiyeyê jî dê heman rewşê li ber çavên me raxe.

Digel vê yekê jî pêwîst nake ku mirov zêde xemgîn be, lewre tevî vî cudatiyê jî îro kurdên Afrînê û yên Wirmiyeyê jî bo heman dozê li ser piyan in û ji berê baştir hev û din fêm dikin û bi geşedana navgînên ragihandinê yên bi kurdî hem di nava devokan de hem jî nava zaravayan

de bingeha yekîtiyê hêdî hêdî dikemile.

Her wiha divê bê gotin ku rewşa kurdan û tirkan jî hev cuda ye, lewre zimaneke tirkî (tirkiya Anatoliyê) bingeha wî qels e. Zimaneke tirkî her tim jî zimaneke din tişt wergirtine, zimaneke tirkî li gorî demê di bin bandora zimaneke din de maye, di dema Osmanî û Selçûkiyan de bandora erebî û farisî li ser zimaneke tirkî diyar bû, di di heyama dawîn a osmaniyan de bandora fransî û di dema Komara Tirk de jî bandora îngilîzî darî çavan e. Lê zimaneke kurdî xwediyê bingeheke xurt e û demeke dirêj wekî zimaneke gelê li çiya û zozanan jî bandora zimaneke biyan dût maye. Her wiha Ji aliyê wêjeya devkî ve yek jî zengîntirîn zimaneke cihanê ye. Pîrbûna devok û zaravayan dewlemendbûna gencîneya peyvên û biwêj û gotinên pêşyan jî bi xwe re aniye. Heke bi awayekî zanistî jî vî dewlemendiyê sûd bê wergirtin dê zimaneke kurdî ji berê pir xurtir û karîgertir bibe. Lê mixabin bajariyên me ji vî dewlemendiyê sûd wernegirtiye. Li cihê ku ji vî gencîneyê sûdê wergirin, an peyvên nû çêkirine an jî ji zimaneke din peyv, qalib û şayesana girtine û bi vî yekê jî zimaneke me ji binî ve rûxandine. Divê rê li ber vî yekê bê girtin û biwêj şayesana kurdî li nava nifşên nûhatî bê belavkirin. Di vî warî de xebata ku hefteya çûyî di rûpel 4-5 de derket gaveke baş bû. Divê xwendevanên me jî dest bavêjin vî karî û biwêjên li derdora xwe bigihînin ber destê me.

SAMÎ BERBANG

Kosowa

NEJDET BULDAN



E-Mail: Buldan@compuserve.com

Gelek saziyên navneteweyî jî bo moral hatine çêkirin. Hinek sazkirina jî bo rewşa aborî, hinek jî bo siyaseta-kultur-civakiyê yekgirtî, hindêk jî bi mebestên leşkerî. Damezirandina saziyên wisa, li gorî pêwîstiyên rojane ne. Hinek jî bo demeke dûvedirêj in.

Neteweyên Yekbûyî piştî şerê cihanê yê duyemîn hat saz kirin. Saziyeke li cihanê herî bilind e. Paşê di bin serokatiya îngilîzan û Amerikayê de saziya leşkerî-siyasî NATO hate damezrandin. Ji bo şerê sar, piranî jî ji bo parastina endamên xwe li dijî komûnîzmê. Li hemberî wê Yekgirtina Warşowa di bin serokatiya Sovyeta berê de hate damezrandin. Sîstema Sovyeta berê helweşiya Yekgirtiyên Warşowayê jî holê rabû. NATO niha dixwaze cihê ku ji Yekgirtiyên Warşowa vala bûye, bi endamên wê yên kevn tijî bike. Mîna Çeko-Slowakiya, Romanya, Macaristan hwd. Lê niha şerêkî xurt li Yûgoslaviyayê heye.

Hinek herêman dixwazin dewletên serbixwe, an jî herêman otonom çêkin. Çîroka wan dirêj e. Lê em dixwazin bi kurtî li ser rewşa Arnawudan û NATO'yê bisekinin.

Hinceta Amerîka û hevalên wê ev e ku li Kosowayê, bi destê Arnawudan şerêkî azadiyê tê meşandin. Dîsa di vî xalê de zilma sirpiyan li ser Kosowayê heye.

Belê me bawer kir ku kosowayî jî bo mafên xwe yên neteweyî şer dikin. Di wî şerî de sirp jî mafên wan pêpes dikin û şerêkî qirêj dimeşînin. Em li ser mafên NATO'yê yên sazûnê tiştêkî nabêjin. Ew mijareke din e. Lê heke NATO li hemû deveran li ser mafên gelên bindest, xwe berpirsyar dibîne gelo çima ji bo çareserkirineke siyasî mudaxelayî Kurdistanê nake?

Li gorî zagona NATO'yê, ev sazî jî bo parastina endamên xwe li dijî êrîşên jî derve bîn hatiye damezrandin. Mîna ku Tirkiye endamê NATO'yê ye, li dijî êrîşên dewleteke mîna Îranê bêhete parastin. Lê heke endamê vî saziyê mafên gelan pêpes bike û bi çekên NATO'yê miletekî qir bike yê çawa be? Li gorî zagona wê saziyê dewleta Tirk nikare çekên NATO'yê li dijî kurdan bikar bîne. Lê ji destpêka şerê azadiyê heya niha bi alikariyên NATO'yê Dewleta Tirk li dijî me şer dike. Û

şereke bi qirêj û bêsinor.

Li vî derê jî durûtiya dewletên rojava eşkera dibe. Ji bo petrolên Kuweytê dikare êrîşan bibe ser Iraqê. Ji bo parastina Bosna û Kosowoyê dikare êrîşan bibe ser Sirbistanê û dikare li dijî kurdan hemû çekên giran û teknîk harîkariya Tirkan bike.

Paşê carcaran li ser mafên kurdan di hindêk saziyên xwe de axaftinan bike. Ew ji rengê têgehiştina wan ya mafparastinê ye. Dîsa dikare li welatên xwe partiyên kurdan qedexe bike. Televîzyonên kurdan bigire. Her dem gefan li Kurdan bixwe û çapemeniya wan bi girtinê bitirsîne. Çalekiyên kurdan ên mafparastina neteweyî bi terorîzmê şermezar bike. Hemû tîkiliyên xwe yên bi dagirkeran re xurt bike. Paşê jî qala mafparastinê û demokrasiyê bike.


Carinan mirov difikire. Gelo çavên me şîn, porê me jî zer bûya, hindêk kurd xiristiyan bûna, helwesta van dewletan ê dîsa ev bûya?

Mirov naxwaze biçûkahî bifikire. Lê dema mirov helwesta wan dibîne, ev pirs tîn bîra mirov. Dîsa jî pêwîst nîn e ku mirov bêhêvî be. Ji ber ku azadiya gelan bi piranî bi şerê neteweyî yê gelan pêk tê. Gotineke kurdan a kevin heye: "Devê tîfinga mor dizane."

Cejna we ya Qurbanê pîroz be.

Şêrê Girê Şêra:

'Sêzdeh heval bûn ji hev re rast bûn'

Süleyman Aslan
(Sari Hüseyin)Abdullah Avcı
(Salah)Kamuran Dündar
(Zana)

Şêrê Girê Şêra yek ji girîngtirîn şêrên têkoşîna rizgarîya neteweyî ya Kurdistanê ye lewre cara yekemîn serhildanan piştî vî şerî rû daye. Ji ber vê yekê strana "Heval Kamûran" li ser vê bûyerê hatiye gotin û gelekî jî bi nav û deng e. Li aliyê din şehadeta 13 gerîlayan jî daxbar û trajîk e. Gerîla ji aliyê malbateke ku demeke dirêj li mala wan dimînin, tên jehrîkirin. Piştî vê artêşa tirk bi hezaran leşkeran diavêje ser gerîlayan.

Wê salê, li Çiyayê Girê Şêra ava bîran zelaltir, kanî û rûbar azatir, çiya û deşt û newal adantir û pelê daran kesk û zindîtir bûn. Bi rêveberiya Fermandarê Eyaleta Mêrdînê Rêheval Salah (Abdullah Avcî) biryara komcivînekê tê danîn. 13 heval beşdarî vê komcivînekê dibin. Komcivîna ku Rêheval Kamuran, Bozo, Hüseyin û deh hevalên ferman-dar û berpirsiyar beşdariya tê de dikin, li maleke ku wekî welatparêz tê nasîn, pêk tê. Mala malbata xwedî pez, li derveyî gund (Gundê Dengiza) û maleke tenê ye. Biçûk û mezinên malê gerîlayan dinasin û bi wan re têkiliyeke germ datînin. Bi salan wekî malbateke pê ewle dixuyin û bi bîr û bawerî tevdi-gerin. Gerîla jî di nav de, tu kes jê hêvî nake ku wê bi dijmin re hevkarîyê bike û bibe xiyaneşkar.

Îcar em jî dê li gorî agahiyên deverî û mirovên ku bûyer bi çavên serê xwe dîtîye, şehadeta 13 hevalan binin ser zimên.

Di sala 1990'î de wekî hemû deverên Kurdistanê li herêma Stewrê jî çalakiyên gerîlayan pêk dihatin û di eniya şer de serkeftinên girîng dihatin bi destxistin. Li Stewrê (Savur) Çiyayê Girê Şêran ji aliyê gerîlayan ve wekî asêgehê dihat bikaranîn. Dewleta Romê bi vê yekê hesiyabû û dil dikir vê

asêgehê bipelişîne. Ji mêj ve hestîkoj û xwefiroşan agahî dabû qereqolên derdorê û wekî kêzikên gûger li herêmê digeriyan. Girê Şêra bûbû navenda her sê herêmên Eyaleta Mêrdînê û Mala Hecî Sebrî jî bûbû biryargeheke zexm û pê ewle. Dîsa biryara komcivînekê li Mala Hecî Sebrî hatibû danîn û 13 hevalên ferman-dar û berpirsiyar dê beşdarî vê komcivînekê bûbûna. Li aliyê din îxanet li ser kar bû û ji zû de planên xayîn li dar xistibûn.

Roja komcivînekê 13 heval li Girê Şêra û li mala Hecî Sebrî dicivin. Wekî her car bi dîlfirêhî û pê ewle li malê li hev rûdinin. Di vê navê Hecî Sebrî qîza xwe ya mezin bi ser Qereqola Stewrê de dişîne lê li aliyê din ew û çar lawên wî xizmeta gerîlayan dikin. Lê belê vê carê bêhtir xizmet û hurmetê ji wan re dikin. Sêçar karan ser jê dikin û goştê sor dibêrêjin. Li aliyê din beroşa savarê dikele û hêkan yeka yeka di nava rûn de diqelin. Firavîn bi derengî be jî amade dibe.

Di vê navê de heval gelekî birçî dibin lê dibêjin: "Mala Apê Hecî me bêfiravîn nahêle. Wê gezek nan û firek av bide me." Firavîn ji her carê bêhtir û tewaştir e. Lê îxaneteke dijwar û nedîtî li dar e. Hemû xwarin bi jehrê hatibûn dagirtin. Li aliyê din dijmin jî di heman demê de hatibû agahdarkirin û bi 5

hezar leşker, tank û topên xwe, wekî tovê kulî li Çiyayê Gira Şêra belav bûbû. Dora malê hatibû girtin. Hewldana hevalê nobedar têra derketina 13 hevalan nake. Dijmin wekî kijikên ser beratê, tank û topên xwe diavêje ser malê û xênî di ser wan de hildiweşîne. Tevî vê yekê heval bi birîndarî xilas dibin û bi saetan li ber xwe didin. Di vê navê de hevalê nobedar bang li Hevalê Kamûran dike û dibêje: "Heval! Ka te digot deh hezar leşkerên Romê têra min nakin. Ma îro çi bi te hat!"

Hevalê Kamûran di halê xwe de dinale û dibêje: "Ez jî nema dizanim çi bû ji min!? Çongên min nayên ber min, laşê min teviziye û destê min çekê nagire lo hevaal...!"

Dar û ber, kevir û kuç, teyr û tilûr bi hev re digiriyan. Gul û kulîkên bihara rengîn çilmisîn û reş girêdan. Xuricîn 13 stêrkên nava asîman. Ji bo wan Kurdistan rabû ser piyan. Şehadeta 13 hevalan bû destpêka serhildanên girseyî li welêt û li hemû deverên Kurdistanê meş û serhildanên girseyî pêk hatin. Xeleka îxanetê ya riziyaî bû toqa lencê û kete stûyê dijminê hov. Dijminê ku nikaribû xwe biparêze, êdî ketibû mitala parastina Kewa edûqewm. Malbata xayin tevî zar û zêçên xwe, xwe spartibû leşkerên Romê. Ne carekê, rojê sed caran dimirin lê dîsa jî

li ber xwe nediketin, pozê wan nedîşewitî û bi wê rewşa xwe razî bûn. Lewre çavê îxanetê kor, guhê wê ker û dilê wê bi mor bû.

Mirovên ku Şêrê Girê Şêra bi çavê serê xwe dîtibûn, bi mitûmatî bûyer wiha vedigotin: "Heta ku em li darê dinyayê bin, em tu caran hovîtiya dewleta tirk û kul û kesera 13 hevalan jî bîra nakin. Jixwe dîn û îman bi Sebrîko û malbata wî re nîn e. Xwedê topa xwe li mala wî dîne, ma heciyê çi ye?" Peyre jî kesereke kûr dikişand û digot: "Ax! Gela çawa destê we çû wan egî-dan û we xwarina bi jehr li ber wan danî û 5 hezar leşkerên tirk bi ser wan de anîn!?"


Li aliyê din yekem car gelê kurd bi girseyî li şehîdên xwe xwedî derket û bi hezaran kes li dû cenazeyê wan meşiya. Roja ku cenazeyê wan ji Girê Şêra hate hilanîn, Heval Kamûran û çend hevalên wî li Nisêbinê hatin veşartin, li Nisêbinê biçûk mezin 70 hezar kes meşiya. Girseyê ev slogan hildidan: "Şehîd namirin, Tola şehîdan sonda me ye." Êdî li Kurdistanê mirin tunebû, jîyan hebû. Dayikên şehîdan xeml û xêza xwe girêdida û digot:

"Li ser saxan nedin girî, şehîd sax in, ew namirin. Bilîfînin...! Kêfa dijmin tu car neyîne."

■ Avrêl 1985:

Hunermend û şoreşger Sefkan şehîd ket


Hunermend Sefkan di sala 1961'î de li qeza Çemişgezekê ku bi ser Dêrsimê ve ye, ji dayika xwe bûye. Navê wî yê fermî Celal Ercan e. Sefkan heya 1980'î bi taybetî li bajarên wekî Amed, Xarpêt û Dêrsimê hem wekî hozan, hem jî wekî endamekî Partiya Karkerên Kurdistan xebat kir. Piştî 12'ê rezberê bi demekê, derbasî Almanya bû. Li wir tevî hin hevalên xwe di navbera 1982-83'yan de Yekîtiya Hunermendên Kurdistan (Hunerkom) ava kir. Sefkan diwî re edigere welêt û beşdarî nav gerîla dibe. Di avrêla 1985'an de li başûrê Kurdistanê şehîd dikeve.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

■ 1894:

Hecî Kadirê Koyî jiyana xwe ji dest da

Helbestvan û welatparêz Hecî Qadirê Koyî di sala 1815'an de li Koysancaxê tê dinê. Li ber destê Feqî û meleyên zana mezin dibe û li gelek bajaran meletiyê dike. Hecî Qadirê Koyî li hemberî bîr û baweriyên feodal radibe û di wî warî de dengê wî bilind dibe. Koyî demeke şûn de diçe Stenbolê û li wir jiyana xwe dom dike. Li wir di komeleyên kurdan de dixebite. Doza azadiyê di nav xwendekar û ronakbîran de belav dike. Ew şopînerê Ehmêdê Xanî ye. Ji ber vê, di helbestên wî de hevgirtin û yekîtiya kurdan cihêkî fireh digire. Di sala 1894'an de li Stenbolê jiyana xwe ji des dide.

ÇAVDÊRÎ**Zarokên Kînê**

SERKAN BRÛSK

Ewrên spî bi dirêjahiya çend sedsalan, di nava çar diwarên dilê min de reş bûne, îro jî, betanê dilê min didin ber brûskan.

Diwarên dilê min nema xwe li ber van lêdanan digirin. Pesta êşê bi tonan giranî li her şaneyek wê dike. Şaneyên van diwarên kevz-girtî nema li ser hev disekin, li ber vê xezeba ku ji neheqîya berdevam a çavsoran dizê. Ewê biherifin, bi ser van azadîkuştên bextfiroş de.

Ger qeyda hezar salan di dest û piyên dilê min de zingar jî girtibe, ezê mîna birûskan ji ezamanên tarîkirî derbasî pêşerojê ronîkirî bibim, bi ahd im, bi soz im, bi biryar im û li hemberî pêşerojê ronî deyndar im.

Bila ahda me be, ey dîroka rûş, emê ranewestî û ranezên, me ji azadiyê ye, ger çend sedsalên din jî, xwe li me bipêçin û li ser rîya azadiyê bêhnê li me biçikînin jî. Emê çavên xwe ji asoyên li lûtkeyên çiyayên xwe derneyînin, ger di vê rîyê de qelpaxên çavên me hişkerep jî, bi ser hevdû de bikevin, emê, wan bi xwîna sar a, ku ji dilê Cûdî dizê ter bikin.

Wê dilê xweşiyê tu carî bej nemîne. Wê timî helbestvanên hêviyê hebin. Ewê tu carî avahiya helbestên xwe ji peyvên têkçûyî lênekin. Ewê dilê xwe ji helbestên hest-mirar re venekin. Ewê risteyên xwe bi peyvên hişyarkirinê bixemilînin.

Lê ew dê wêneyên têkçûnê bi peyvên şêrîn ên zimanê xwe risim nekin û ezmanê xwe ji stêrkên geş re reş nekin. Ew ê ferhenga helbestên xwe ji rengdêrên têkçûn û têbirinê rizgar bikin..

Û em dê li hemberî zeman û dîrokê, wisa asan dest û piyên xwe ji wan re daneynin serhev, û dîsa em ê, stûyê xwe ji wan re dirêj nekin, lewra em ê bibin xîreta berxwedana vê sedsalê. Va ye, gurme-gurma ewran e, di ser hev re bi hêz diqulpin, dixwazin rizgar bibin, dixwazin belav bibin, dixwazin xezeba mîrikê romî li wî vegeftin, ku wî di şeveke tarî de, di kateke bê wext de, bi devê tivingê ji wan re hiştibû.

Wan bi kînê salên xwe yê zarokiyê derbas kirine. Ew zarokên kînê ne. Lewra jî, sonda wan bi agir e, peyva wan ji dilê bi kul e. Bi vê milamê xwe berdane kolanan. Ew ji serî heta binê piyên xwe reş girêdayî ne.

Ew mîr in. Mîrê êşê ne. Birîndarê şevê ne. Qefiliyê seqemê ne. Di her xelek salê wan de hezar birînen xwêkirî. Di her xelek salê wan de çend temenên qurquçandî.

Pesta di dilê min de bagerê li hesta bindestiyê radike. Serê di ber min de bilind radike. Bêbextî serê min kut dike.

Dilê min di nava bedena min de giran dibe. Êdî nema karim hilgirim. Di her şaneyê wê de giraniya çend hezar salan, min diwestîne..

Hilma ku di navbera zemîna cîhanê û binya banê ezman de para min ketiye, mîna pîjan di çavên bextfiroşan de radibe...

Li ser qehrê cîhanê, emê li ber xwe bidim da ku ji malbata wê bavikek din jî...

Bo MED-TV greva birçîbûnê

Greva birçîbûnê ku bi beşdariya 21 kesî sînorkirî ye û wê heta 12'ê avrêlê dom bike, roj-namegerên wekî Burhan Karadeniz, Ali Osman Ölmez, Günay Aslan, Burhan Erdem, Kamer Söylemez, Meliha Kartal, Mehmet Kara, Mediha Aslan, Eyüb Burç û hwd. beşdariyê tê de dikin.

Ji bo protestokirina cezayê ku ITC'yê li televîzyona kurdî MED-TV'yê bîriye ya girtina 21 rojî, rewşenbîrên kurd li bajarê Londonê roja 29'ê adarê dest bi greva birçîbûnê kir. Ev çalakiya gireva birçîbûnê, ji hêla Yekîtiya Rojnamegerên Kurdistanê (YRK) 'ê ve hatiye sazîkirin.

Komîteya Piştigiriya Bo MED-TV'yê ya bi ser YRK'ê ve da zanîn ku armanca vê çalakiyê ev e ku cîhanê bi pest û pêkutiyên li ser sazîyên ragihandinê yê kurdan bihesîne. Berdevkê komîteyê li ser çalakiyê ev tişt gotin: "Armanca vê çalakiyê ev e ku raya giştî ya îngilîz li ser biryara girtina MED-TV'yê agahdar bike û di van rojên ku di warê kêşeya kurdî de qewimînên erjeng pêk tînin de, êrîşên dewleta tirk ên li ser mafê derbirinê yê kurdan li ber çavên cîhanê raxin. Herwiha hate daxuyandin ku dê ev çalakî heta kutabûna cezayê MED-TV'yê bidome û dê 21 rojnameger di çalakiyê de beşdariyê bikin. Her wiha hate gotin ku dê çalakî bi awayekî bêdeng bê meşandin.

Tê hêvîkirin ku rewşenbîr û siyasetmedarên îngilîz jî piştevaniya çalakiyê bikin. Tê gotin ku dê siyasetmedar û rewşenbîrên pêşverû û mafparêz ên mîna Tony Benn û Jeremy Corbyn biçin serdana rewşenbîrên kurd.

Berpîrsên YRK'ê da zanîn ku bi girtina MED-TV'yê derfet nemaye ku nûçeyên rast li ser rewşa Kurdistanê bê girtin. Heman kesan bi bîr xist ku MED-TV ji bo nûçeyên alternatîf tekane çavkanî ye, lewre çapemeniya tirk ji hêla dewletê ve tê kontrollîkirin. YRK bang li raya

giştî kir ku li ser rewşa gelê kurd pejinkar be, lewre ev gel ev 75 sal in ji ber polîtîkayên dewleta tirk ên mîlîtarîst tê çewsandin.

Ji kurdan televîzyoneke nû

Li Almanya, Fransa û Danîmarkayê jî biryara girtina MED-TV'yê bi çalakiyên cur bi cur hatin şermezarkirin. Li paytexta Almanya Berlinê, li Qada Olivear meşek hate lidarxistin. Di vê meşê de televîzyonên zincîrkirî jî hatin nîşandayin. Nêzî çar hezar kesî di vê çalakiyê de beşdarî kir. Endamê PKDW'ê Felemez Başboğa jî yek ji beşdarên çalakiyê bû. Her wiha digel rêxistinên mîna MLKP û PRK-Rizgarî, Ciwanên Sosyalîst ên Alman jî beşdarî çalakiyê bûn. Komîteya Rêveber a Meşê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hate gotin ku gelê kurd bersiva kesên MED-TV girtiye, daye. Endamê PKDW'ê Felemez Başboğa jî di çalakiyê de axaftinek kir. Başboğa got: "Wan MED-TV girt, lê bila ew bizanin ku dê li pey wê sê MED-TV vebin. Bi girtina MED-TV'yê nikarin dengê gelên bindest bibirin."

Li hêla din li gorî agahiyên ku bi dest ketine televîzyoneke nû ya kurdan dest bi weşanê kiriyê. Tê gotin ku televîzyona navborî ji bo niha bi tîne rojê du saetan (19.00-21.00) weşanê dike. Li pey heman agahiyên navê ve televîzyonê C-TV ye û li peyka Eutelsat (peyka berê ya MED-TV), frekansa 1327 (horizontal) derdikeve. Ev frekans nêzî cihê NTV'ya tirkan e.

NAVENDA NÛÇEYAN

Nivîskar û Cîgirê Serokê PEN'a Kurd Zerdeşt Haco:

Di warê zimên de pêşveçû

Di warê zimên de pêşveçûnên mezin hene. Lê ne rihet e mirov di demeke kin de zimanekî bilind çêbike. Bi hindikayî 40-50 sal lazim e. Lê ji bo vê jî; divê li ser hemû zaravayan lêkolînên têkûz werin kirin û divê em di serî de mamosteyan bigihînin ku, bi hemû zaravayên kurdî bizanibin.

Î.CAN DILBIRÎN

Zerdeşt Haco her çend wekî Cîgirê Serokê PENA Kurd tê nasîn lê ew demeke dirêj e li ser zimanê kurdî û dîroka kurdan xebatan dîke. Wî, li ser têkoşîna Mala Haco, tîkiliya wê û rewşên bîrên kurd, PENA Kurd, konferansa navneteweyî ya ziman û wêjeya kurdî, yekîtiya zimanê kurdî, zimanê çapemeniya kurd û mijarên cur bi cur hest û ramanên xwe der birin

Wekî diyar e Mala Haco malbateke navdar û dîrokî ye. Qet rojekê bala we kişand ku hûn li ser dîroka malbata xwe lêkolînekê pêk bînin?

✓ Spas ji bo vê pîrsa we. Bi rastî dema ku hêj em zarok bûn, ji Pîrsa Kurdayetiye pêştir tiştêk di nav malbata me de tunebû. Em zarok bûn lê ku em diçûne ku, her dem behsa Doza Kurdistanê dibû.

Tê bîra min di wextekî de, dema ku memûrê ereban dihatin, berî ku werin musadê ji mala me bixwazin newêrabûn werin. Ji ber ku hêzeke siyasî li herêmê hebû. Hingî me karibû, tora xwe, çanda xwe û zimanê xwe biparasta. Di nav me de ji bilî kurdî, axaftin şerm bû. Heta wexta yekî ji me gotineke erebî bigota, xwişk û birayê min tinazê xwe pê dikirin.

Li ser mesela lêkolîne. Belê, min pir xwest, heta min gelek berhem kom kirin ji weşanên Xoybûnê. Bi taybetî li ser dem û serdemên ku Îhsan Nûrî Paşa û Cegerxwîn di serpêhatiyên xwe de behs kirine. Înglîz û frensiyan li ser kalîkê min Haco pir tişt nivîsandine. Tim ew şopandine û di bin çawa de girtine, ji bo ku rê nedine da ku xebateke siyasî ya mezin bike. Mesela tevger û serpêhatiyên wî roj bi roj nivîsandine. Rojekê ku ji Tirbespiyê hatiye Qamişlo nivîsandine: "Haco felan rojê ji felan cihî çûye Hesîça"

Ez dixwazim bi kurtî bêjim; gava kalîkê min ji derdora Midyatê hate başûr mişt tîjî rihê welatperweriyê bû. Ya din gava mirov serpêhatiyên Cegerxwîn dixwîne, tê xuyakirin ku ew û kalîkê min her roj bi hev re bûne. Ew bi şev û roj çêlî Doza Kurdistanê dikin. Heta Cegerxwîn bi xwe gotiye Haco ji Yekîtiya Neteweyan re nameyek şandiye. Wî gotiye ew dixwazin dewletekê ava bikin û dûvre nivîsandine bê çawa Fransayê nehiştiye ku dewlet were avakirin.

Yanî materyal pir in, ku mirov lêkolînekê li ser bike. Lê ez niha dikarim bêjim kesên ku xwe bi kurdayetî û Doza Kurdis-

tanê ve girêdayî ne, li ser Haco nenivîsandine. Lê di tekoşîna Kurdistanê de bi rastî giraniyê wî ya berbiçav hebû. Dibe ji ber ku axa bû yanî ne kesekî ku zanîngêh qedandîbû û axayek nikare bibe serokê dewletekî.

Mesela di wextê Haco de, Midyat paytexta konfederasyona eşîretên li herêmê bûye û Haco bi xwe jî serokê wê konfederasyonê bûye, li ser vê yekê qet agahî di destê we de hene?

✓ Bi rastî min tiştêk li ser vê nebihîstiyê. Belê ez pê dizanim di nava Xoybûn de giraniyê Haco hebûye. Niha mirov dev ji vê jî berde, alîkariya ku ji Mîr Celadet Bedirxan û birayê wî Kamûran re hatiye kirin yanî xebata wan a ku bûye, çî siyasî û çî eskerî tev bi piştgiriya Haco pêk hatiye. Mirov dibîne ku rojname û kovarên ku wê demê derketine, tev bi alîkariya Haco û pereyên wî derçûne. Mesela min di rojanmeyerê kevn de xwend, axayên kurdan ku wê demê alîkariyê dikin hatine nivîsin. Ê wî di wî wextî de, 800 wereqê pereyên sûriyê yê dabûn. Mirov dibîne ku di navbera wî gelek kesan de ferq heye.

Tê bîra min, heta Prof. Îsmet Şerîf Wanlî û Dr. Nûretîn Zaza dema ji bo xwendinê derketine Ewropayê bi alîkariya Haco, bi pereyê Haco derdiketin û dixwendin. Ew li Siwîsreyê jî bûn, dîsa alîka-

riya wan dikir.

Hîç bandora malbata Bedirxaniyan li te bû?

✓ Di serî de min nizanibû rastî. Peyre dema min lê kola, min dît Mîr Celadet Bedirxan bi xwe li ba me, li gundê me bûye. Heta di pirtûka wî ya rêzimana kurdî de, hin mînakên wî vê yekê dipeyitînin. Mînakên wiha dide: Keça Haco ya mezin û Kurê Haco yê mezin. Ev dide xuyakirin ku tîkiliya wî bi malbata me re xurt bû.

Îro hin kes li dijî alfabeya Celadet Bedirxan radibin. Hûn alfabeya wî çawa dinirxînin?

✓ Ez bawer im ew kesê ku vê yekê napêjirînin û naxwazin pê binivîsin, bi rastî kesine ku qet bi zanistî xebat nekirine. Celadet 20 salan li ser wê alfabeyê xebat kirîye. Mîr Celadet mirovekî rewşên bîr bû. Belkî heta îro di nav kurdan de, yekî wekî wî ranebûye. Wî bi zimanê yewnanî, frensî, almanî, rûsî, erebî, farisî û tirkî zanibû.

Gava alfabetaya xwe daniye, guhertiye her û her ceribandîye, heta ku pê serwest bûye. Niha ew hevalên ku pî didin ser meseleya îango îyê bi awayekî îdeolojîk tevdigerin. Bi tenê dixwazin bibêjin: "Çima hinek wiha dinivîsin em jî dê wisa binivîsin!" Yanî tu bîngeha wê ya zanistî nîn e. Min beriya niha di dîrsa xwe de da-

bû xuyakirin, gava ku em îyê xwe wekî ya tirk binivîsin, em ne tenê nîşana tirk distînin, em dengê tirk jî distînin. Dengê ku ew nîşan dikin, em tînin tevî zimanê xwe dikin. Lewre ew dengê xerîb e, ne ji dengê zimanê me ye û gava ew deng dikeve nava du dengên kurdmancî, xwe li wan dengê din jî vedide. Wan dengan jî, bi xwe re xera dike. Min gelek caran mînak dane; dema ku mirov lêkera "kirin" binivîsîne û tu nîşanî yekî bi kurdî nîzane bide, ew dê wekî tirk bixwîne, ne wekî kurdî. Yanî dengê kurdmancî tê guhertin. Wextê tu were wan nîşaneyan bibîne, ew xal bûye nîşana wî dengî, bi dest xwe re ew li mêjiyê wî kesî dixê û wî dengî dibêje.

Dema Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan hate Romayê Serokê PENA Kurd jî çû serdana wî. Hûn wekî Cîgirê Serokê PENA Kurd vê yekê çawa dinirxînin?

✓ Bi rastî PENA Kurd a ku di 29.6.1990'î de, bi rêberiya birêz Hüseyin Erdem hate damezrandin, heta sala 1993'yan xebateke baş kir. Peyre birêz Erdem nexweş ket û serokatiya PENA Kurd kete destê hinek kesên din. Ev kes, bi bar û erkên xwe ranebûn û hiştin ku di Kongreya 1996'an de, li Guetadehara li Meksîko ku PENA Kurd were betalkirin. Yanî eger xwe pê re negihanda û neçûbû-

Malbata Haco bo Doza Kurdistanê xebatên hêja kirîye û mirovên hêja gihandine. Zerdeşt Haco vê yekê wiha tîne zimên: "Xebata ku ji Mîr Celadet Bedirxan û birayê wî Kamûran kirîye, çî siyasî û çî askerî tev bi piştgiriya Haco pêk hatiye. Mirov dibîne ku rojname û kovarên ku wê demê derketine, tev bi alîkariya Haco û pereyên wî derçûne."

(Wêne: Li ser piyan li milê çepê kesê duyem: Dr. Nazîf 'Bîrayê Nûreddin Zaza', li navê Celadet Bedirxan 'ê bi rih' û ji milê rastê ve kesê çarem Memduh Selim Beg)




En mezin hene

ZERDEŞT HACO KÎ YE

■ Zerdeşt Haco, kurê malbateke navdar e, ku gelek caran li dijî dewleta Osmanî şer kiriye. Binyata wê malbatê jî derdora navçeya Mêrdînê Midyatê ye. Malbat bi serhildana bi navê Berxwedana Haco ya sala 1926'an li Çiyayê Bagokê tê naskirin. Ji tenê li Bagokê, bi Teloyê jî Omerî Mazgirtê û bi komeke şervanan re, heta bi Mûşê birek çalakî pêk anîne. Heta di navbera herêmên Kurdistanê yê dîtir û Agiriyê de jî, têkilî û girêdanan çêdikin. Ji ber ku wê demê Agirî jî bo serxwebûna Kurdistanê dibe navend. Hemû şervanên kurdan jî wê hêz û îlham digirtin. Her wiha Haco li herêmên wekî Midyat, Mêrdîn û Şirnexê serokatîya eşîra Hevêrkiyan kiriye. Dîsa beriya Haco yê duwem, di sala 1919'an Serhildana Elîkê Betê li derdora Mêrdînê, li dijî zordariya tirkan dest pê kiribû. Ji bilî van Haco di avakirina Xoybûnê de xwedî rol bûye. Wekî din tê gotin di hemû serhildan û berxwedanên wê demê de Mala Haco cihê xwe girtiye. Mala Haco jî bilî van yekan li herêmê Konfederasyona Eşîretên Kurd jî ava kiriye û serokatî jê re kiriye.

Zerdeşt Haco jî yek ji endamên Mala Haco ye. Wî, xwe wiha da naskirin:

"Ez jî başûrê rojavayê Kurdistanê me. Ez bi zanebûn nabêjim Başûrê Biçûk. Malbata me, nêzîkî sala 1925'an di bûyerên Şoreşa 25'an de hate xwar. Destpêkê rewşenbîrên kurd yê jî ber têkçûna şoreşê hatibû koçberkirin, yê wekî Celadet Bedirxan, têkiliya wan û kalîkê min Haco xurt bû. Dostaniyeke pir baş di navbera wan de hebûye. Herdu bi hev re di Xoybûnê de bûn û xebatên wan di Xoybûnê de hene, ku heta niha hîna jî zelal nebûne. Ji ber ku hêj di dîrokê de lêkolîn li ser wan çênebûne. Wekî din ez dikarim li ser xwe bêjim ku ez di sala 1970'yî de piştî min xwendina amadeyî (lîse) çûme Çekoslovakyayê, ku îro bûye du dewlet; Çekya û Slovakiya. Li wê derê min xwest ku ez li ser zanyariya zimanê kurdî bixwînim. Hêj li welat, ji min re kul bû ku ez rojekê li ser zimanê kurdî bixwînim. Gava ku hatim Çekoslovakyayê, ew derfet bi dest min neketin, li min barkirin ku ez zanyariya civakî bixwînim. Lê ez bi vê yekê razî nebûm û ji wî welatî bi qaçaxî hatim Elmanyayê li Berlîna rojava bi cih bûm. Li vir min dest bi xwendina germanîst ku jê re wêjeya elmanî tê gotin kir û di nav wêjeya germanîst de, min giranî dida ser lîngûstîk yanî beşê min ê yekê lîngûstîk bû. Ji ber ku zanyariya zimên beşeke bi serê xwe nîn e. Ji ber vê yekê min jî li ser zanyariya zimên beşa lîngûstîk kuta kir. Beşê xwendina min ya duwem wêjeya elmanî ya nû bû û beşa duyem jî îranîstîk bû. Yanî dîroka Îranî. Gava mirov dibêje îran, bi tenê ne îrana nû tê bîra mirov. Ya min li ser tora Îranî bû. Yanî wekî mirov bêje kelepura Îranî.



na Kongreya li Edinburgê, diviyabû PENA Kurd jî nava PENA Navneteweyî hatiba derxistin. Ji me re pir zehmet dibû ku em careke din xwe bi wan bidin qebûlkirin. Ji hingî ve dema ku ez û birêz Serokê PENA Kurd Haydar Işık çûn, me ji wan re diyar kir ku em ne girêdayî tu partî û rêxistinên siyasî ne. Lê wan hevalên beriya me, ji PENA Navneteweyî re name şandibûn, telefon dabûnê û gotibûn: "Ev kesên hanê ji PKK'ê ne û vê hêzê ew anîne." Belkî bi nav nekiribûn, lê gotibûn bi partîyeke haha ve girêdayî ne. Lê ew hewldana wan neçû serî û dawiyê di 1.2.1997'an de, li Berlînê kongreyek pêk hat. Ji bo wê jî, me berê jî hemû kesên nivîskar re name şandin. Kesên ku hatibûn di navbera xwe de komîteyek hilbijartin û ew heta niha jî xebata xwe berdewam dikin. Di sala borî 1998'an de, em çûne Helînkî û li wê derê jî, xwe bi wan da qebûlkirin. Yanî şertên ku ji me xwestin, me bi cih anîn. Ji biryarên ku me bi wan dane qebûlkirin, li ser wêjeya zimanê kurdî sazîkirina konferanseke navneteweyî hebû. Di wê konferansê de, nûnerên 93 neteweyan hatibûn û tevan jî, ji bo qebûlkirinê destên xwe hildan. Heta PENA Tirk jî, ji tirsar pirdengan li dijî derketin. Niha di meha çaran ango avrêlê de ev konferans dê pêk were.

Wê ev konferans li ku derê çêbibe?

✓ Wê li Brüksel li Parlamentoyê Ewropayê çêbibe. Wê gelek kesên navdar ji PENA Navneteweyî û kurdan beşdar bibin. Me hêvî heye, wê ev konferans dengê mezin vedê.

Piştî hatina Serokê PKK'ê bo Romayê, çi erk û bar kete ser milên rewşenbîrên kurd?

✓ Wekî hûn jî pê dizanin PENA Kurd saziyeke çandê ye û li ser wêjeya kurdî xebatê dike. Ne rêxistineke siyasî an jî saziyeke siyasî ye lê bêguman wekî min got em bi tu partî û rêxistinên siyasî ve ne girêdayî ne. Belê PENA Kurd wekî saziyeke kurdî li ser wêjeya zimanê kurdî hişyar e û her wiha li ser çî bi serê nivîskarên kurdî, çî bi serê wan kesên ku di ber tekoşîna rizgariya neteweyî de dinivîsîn tê, hişyar e. Gelek nivîskaran baş û nebaşîya hatina Serokê PKK'ê Öcalan di gotaran de nivîsandin, dane xuyakirin. Yanî bi kurtasî PENA Kurd saziyeke fermî û navneteweyî ye û dikare di nava PENA Navneteweyî de li ser ziman û wêjeya kurdî, çawa tê perçiqandin behs bike. Ji ber ku gava nivîskarên cihanê tene cem hevûdin û kom dibin, em kul û derdê wêjeya xwe ji wan re dibêjin. Ew jî dibînin ku çî tê serê me û çawa kultura me tê perçiqandin. Vêca em dixwazin wan ber bi xwe de binin, da ku alîkariya me bikin.

Hûn dikarin hinekî din behsa xebatên xwe yê li ser zimanê kurdî bikin?

✓ Bi rastî hêviya min ew bû ku li ser zimên bixwînim û ji dema hatime Ewropayê ve jî, min xwendina xwe li ser zimên berdewam kir. Min doxtoraya xwe li ser avahiya zimanê almanî û kurdî standiye. Min dil hebû avahiya kurdî û almanî di warê fonetîkê (dengsazî) de bidim ber hev. Min 663 rûpel li ser nivîsandiye. Her wi-

ha ji roja min xwendina xwe qedandiye heta roja îro, ez li ser zimanê kurdî semînarê didim. Yanî min li Xwendegaha Berlînê ya Bilind gelek semînar da û wekî din min li Zanîngeha Esenê û li ya Brêmenê jî pir semînar dane. Jixwe heta niha îro li Hamburgê li ser zimanê kurdî dersên min hene.

Demekê we ji bo amadekariya mamosteyên kurdî jî, li Swîsreyê kursên hîndekarî û pêgihandinê pêşkêş kiribûn, gelo hûn gihane encameke?

✓ Belê. Li Swîsre li bajarê Zurichê me serperîştîya kurseke zimanê kurdî kir. Yanî jî wextê ku ez hatim ve, bi zimanê kurdî ve girêdayî me û li ku derê bibe ku ez keysê bibînim, ji bo dibistanan teksîr nakim. Dema me cara pêşîn li Bremenê perwerdehiya bi zimanê kurdî da qebûlkirin, me gelekî tengasî û dijwarî dît. Niha me pirtûkê jî çêkirine û bi reneki fermî hatiye qebûlkirin. Bi mebesta ku rojekê li Eyaletê, li parêzgehekê were pêjirandin, ku êdî hin bi hin li hemû parêzgehên Almanya were qebûlkirin.

Li aliyê din bi xêra van xebatan wê alman ji tirkan re bibêjin: "Ka me li vir ev maf daye kurdan lê hûn li welêt nadin?" Ew şagirtên ku li van deran mezin bibin, wê di pêşerojê de zorê li Tirkiye bikin ku zimanê kurdî qebûl bike.

Baş e. Hûn zimanê çapemeniya bi kurdî, ji bo civaka me çawa dinirxînin?

✓ Niha di zimanê me de pêşveçûnê mezin hene. Ez bawer im, sal bi sal em ber bi zimanekî neteweyî ve jî diçin. We-

kî mînak heta niha li ser zaravaya kirdkî ango zazakî pirtûk nebûn. Niha em dibînin pirtûk derdikevin, gotar tene weşandin û hin bi hin pêşveçûn çêdibe. Di kurmançî de gelek devok hene, lê em dibînin ku hin bi hin rêzimana ku Celadet nivîsandiye, di civakê de cihê xwe digire. Ez dikarim bêjim ku ji kesên ku bi kurdî dinivîsîn jî sedî 90 wê qebûl dikin û li gorî wê dinivîsîn.

Ji bo yekgirtina zimên divê kurdî çî bikin, da ku zimanekî wan ê neteweyî pêk were? Ew jî bê ku devokên herêmî betal bibin?

✓ Niha ne rihet e mirov di demeke kin de zimanekî kurdî yê bilind çêbike. Bi hindikayî 40-50 sal lazim e. Lê ew jî bi vî awayî dibe; divê li ser hemû zaravayan lêkolînên têkûz werin kirin û divê em di serî de mamosteyan bigihînin ku, bi hemû zaravayên kurdî bizanibin.

Çi têkiliyên we bi înstîtuyên kurdî re hene?

✓ Têkiliya min bi ya Berlînê re heye. Ew gotarên ku min nivîsandine tev min ji wan re şandine û di Kovara Lêkolînê de gelek jê hatine weşandin. Ya din me kêfxweş dike zanyarên kurdî çêbûne û lêkolînê li ser zimanê xwe dikin. Ev dewlemendiyeke hêja ye.

Birêz Haco heta niha qet pirtûkên we hatine weşandin?

✓ Bi rastî min ne pirtûk lê li ser ziman û zanyariya zimanê kurdî û lîngûstîkê zimên, hem bi almanî û hem bi kurdî min gelek gotar nivîsandine.

Di şoreşê de wêje û rewşenbîr (3)

ABDULLAH ÖCALAN

Hedefeke edebiyatê ye evîn. Bêyî ku mirov evînê fêm bike, nikare bibe wêjekar. Ev nehatine fêmkirin. Evîna kurdî bi serê xwe mijareke wêjeyê ye. Ev evîn dê çawa be? Heke dil li ser armançê evînê bin, dikarin mezin bibin.

Em dê evînê çawa rave bikin? Mirovên me yê herî baş dema keysa xwe lê tînin, xerabiya herî mezin dikin. Ji sedî nodê kurdan welê ne. Dema serbest bimîn, kê û zêde dê hemû kurd vê yekê biceribînin. Azareke dijwar, trajîk, trajîkomîk! Edebiyat li ser van terzan jî dixebite. Diviyabû metodek din jî peyda bikira.

Çivîk bi xwe heke cihekî ewle nebînin, lê hêlînê çênakin. Em warekî bi dest bixin, ji bo ku hûn dilşa û dilwêrek bibin. Bila hinek pereyên me hebin, em birçî nemînin. Em hinek herêmên welê bi dest bixin, ku hûn bikaribin rehet bifikirin. Lê herî pir dozîng(güdü) serî hildidin. Dozîna birçîbûnê, dozîna seksê û dozîna navxweyî û hwd. Ji bo birçîbûnê tişt namîne bike. Ji bo dozîne, ji bo dozîna seksê beriya bigihê 15 saliya xwe, xwe têk dibe. Niha ev handikapeke mezin e, lîstikek e mezin e.


Li Freud bikolin

Li vir tu dê dil biafirînî! Tu dê hinekî estetîkê bi kar bînî. Ji bo têrkirina birçîbûnê, tu dê bikevî nav hewldaneke mezin. Ji ber ku yê/a birçî her tiştê xwe difiroşe. Dozîna seksê dozîneke tund û dijwar e. Heke mirov vê dozîne hefsar û saz neke, mirov dê têk biçê. Freud û çend zanyarên din bixwînin û lê bikolin. Ez bang li we dikim ku hûn lê bikolin. Heke hûn dixwazin berhemana biafirînin, li ba me jî mînakên giranbiha hene. Divê hûn lê bikolin, da ku pêvajoyeyê wêjeyî rû bide. Ez dê ne bi tenê edebiyata wê bikim, min divê pratîka wê, siyaseta wê û hinek jî jiyane pêk bînim. Ez tevdira xwe digirim. Heke ez negirim, dê artêşa me ji dest biçê. Îxanetê di min bide, ji par re, ji pêr re, ji kêlekê ve. Divê ez wê rawestînim û divê rikdar bim.

Êdî nivîskariya mîna Ehmedê Xanî têr nake. Em dixwazin bibin qral, wekî wî dixwest. Heta carna ez dibêjim ev jî têr nake. Li aliyekî Zîn, li aliyekî Mem afirandin. Yekîtiya kurdî, eşqa kurdî û wêjeya kurdî afirandin, bi bersivdana van pirsan ve girêdayî. Mirov bi hêsanî nabe wêjekar, çawa ku bi hêsanî nabe şervan. Edebî karekî cidî ye. Ji bo ku wêje li dar bikeve, divê jina kurd, mêrê kurd û egîdê kurd analîz bikî.

Ya herî girîng jî tu dê vê kesayetiye çawan bikî? Tu tîxî bin axê ax nahewîne. Ez ji hemû hevalan re dibêjim. Yekî li nik we, bi we re xebitiye, we çawan ew

nedît? Ev xayîn, ev mikrob ne di nav wan de ye? Çima hûn nabînin? Hîç rêz û hurmeta we ji hêvî û şerê vî gelî re nîn e? Heke hûn keysa xwe lê bînin, hûn dê yekser birevin. Bala xwe bidinê, li cem min kes nareve. Ez li vir newêrekan dikim wêrek, xayinan jî îslah dikim. Ez organîzatorekî mezin im û dilê ku bi wan re tune, didim wan. Ez bi mekanîzmeyên xwe diafirînim. Tu kes nikare ji min re bibêje: Te ewçend derfet hebûn, te çima bi kar neanî? Ez bi kuliya derziyê dikolim û didim xizmeta we. Lê ez xwe jî, hê di vî warî de reben dibînim. Ez xwe di Pîrsa Kurdî de mîna zarokek ku nû bi piyan bikeve, kesekî xwedî mafê gotinê û cesaretê dibînim. Lê navê evîna mezin nîn e, ev dijwar e.



Zeynep Kinacı: Bangeke evînê ye, lê bêyî mirov xweliya wê li erdê bihêle... Ez hîna jî şirove dikim. Ew xudewanek (tanrıça) e. Wêjekarê mezin, ger li ser navê neteweyiyê vê bûyera mezin nebîne, dê bibe wêjekarê çi?

Baş e. Em dê hezkirina mezin çawa pêk bînin? Niha hezkirin bi serê xwe şerêkî mezin e, heta ji şerê jî dijwartir e. Ez li ser vê mijarê pêwîst dibînim ku diya xwe bi bîr bînim. Wê digot: "Wey li min! Ev kurê min dê ji xwe re keçekê nebîne û kes jî keça xwe nade wî." Ez hinekî bêhêvî diditim. Wateyê vê gotinê heye. Ne yek min bi hêsanî qebûl dike, ne hunereke min a wisa heye û ne jî ezê ku li ser rîya pêşketinê me, vê yekê qebûl dikim. Hîn jî wiha me. Bila tu kes bi awayekî din şirove neke. Hîn jî me ev huner bi dest nexistiye. Ez xwediyê dilbijiyê mezin im û ji bo ku kesî biçûk bixim nabêjim. Hemû jî hêja ne!

Ji bo keçan prensîbên min hene. Lê ez ditirsim, di mijara ecibandî û tîkiliyan de dijwariyên min hene. Dema ez dibêjim "ez", divê mirov di çarçoveya neteweyî de vê organîzasyonê bifikire. Li hemû keç û xortan bifikire. Deraxa neteweyî. Ev prensîb in. Divê mirov wisa tîbigihê.

...Ez dubare dikim; mesele ne ez im,

tîpekî kurdî tê afirandin. Û ewqas gel ji min re li çepikan dide. Ez ji vê yekê re îxanetê nakim. Ewqas jin radibin ser piyan, ez îxanetê li wan nakim. Ji bo îhtiras û hestên xwe yê kor... Divê ez ji gelekî ku ewçendî rabûye ser piyan re hurmetkar û rêzdar bim. Divê ez ji hemûyan re bibim bersiva dil. Ev hemû rehên wêjeya kurdî ne.

Em li wêjeya tirkî ya ku hatiye afirandin binihêrin; heke pîrseke talî be jî, ez bawer dikim ku mijara gotûbêjê ye. Ji ber ku balkêş e, ez dixwazim analîza Yaşar Kemal, Yılmaz Güney, û heta Ahmet Arif bikim.


Yılmaz dê bûbûya sînemagerekî kurd ê bêhempa

Yaşar ji ber Wanîbûna xwe û bicîhbûna li Çukurovayê bû Yaşar. Kurdên karer li wir gelek in û naveroka ciyakî diyar dikin. Veqetîna wî ji Wanê, piştaftin û jihevketina eşîretê, wî dike evîndarê "İnce Memed". Bi baweriya min bîngeh ewqas zelal e, bêyî em bikevin kîtekîtan, salixdar e. Lê Yaşar Kemal xwe wêjekarêkî tirk hesaband. Niha dibêje, eslê min kurd e. Ew, berhemeke komelkujiya kolonyalîstan a di warê wêjeyê de ye, lê hemû ne ev e. Ew êş û azarê dikîşîne. Encamên komelkujiyê ne bi temamî be jî, tîne ser zimên. Em dikarin wekî "wêjeyêke melez" bi nav bikin. Bi temamî ne kurdî nehesibandî jî û bi temamî tirkî jî hesabandin ne di cih de ye. Wêjeyek e ku divê ji hev bê veqetandin.

Em vê yekê di kesayetiya Yılmaz Güney de dikarin baştir bidin xuyakirin. Wî, demeke dirêj xwe wekî sînemagerekî tirk hesaband. Beriya koça xwe ya dawîn got: "Ez sînemagerekî kurd im." Ger Yılmaz bijiya dê helwesta wî zelaltir bûbûya. Ew, dê bûbûya sînemagerekî kurd ê bêhempa. Nişaneyên vê yekê hebûn.

Ahmet Arif: Bi dilê xwe bi temamî kurd û Amedê dibihîze. Lê wekî şikl bi temamî tirkêkî pêşketî ye. Ev yeka hanê jî pêşan dide ku, di rewşêke melez û jihevsaftîkirinê de ne. Ev romanîvîs, helbestvan, û sînemagerê demên komelkujiya kolonyalîst a herî dirinde ne. Divê mirov wan wekî takekes tawanbar neke. Lê di nava alozî û dijwariyê de dijîn. Rewşêke taybetî û dubendiyê ku dê ji hey cihê bibe dijîn. Heke em rewşa wan gotûbêjê bikin, divê mirov vê rastiyê destnîşan bike. Heta yê wiha di warê wêjeyê de gelek in.

Li ser vê bîngehê, di warê wêje, muzîk û sînemayê de yê herî çalak dîsa kurd in. Ev dişibe rewşa reşîkên amerîkayî ya di warê çand û spora Amerîkayê de. Di wêjeya tirkî de karakterê melez pir diyar e. Ev di muzîka tirkî de jî wisa ye. Roman bi giranî welê ye. Mirov bêyî ku van ne kurd bihesibîne, divê ji hev cuda bike. Divê dewlemendiya ku li zimanê kurdî zêde kirine, baş bibînin lê înkarkirina nasnava xwe ya neteweyî, bêguman



Öcalan di vê beşa dawîn a nivîsa xwe de li ser pêwendiya evîn û wêjeyê, kesayetiya kurdî û kurdên bo çand û hunera tirkî xebitîne (Yılmaz Güney, Yaşar Kemal, Ahmet Arif) radiweste. Bi baweriya Öcalan, ger Güney bijiya dê bûbûya sînemagerekî kurd ê bêhempa.

ne baş e. Lê divê hêdî hêdî xwe zelal bikin û li xwe vegerin. Erkeke wan a wisa heye, zelalbûna wan divê. Digel ku di dema şoreşê de derfet çêbûne jî, ji ber ku ji orjîna xwe ya neteweyî re nebûne bersiv, divê mirov êdî ji wan re nebêje wêjekar.

Pirsgirêka zimên û zaravayan

Yên ku dibêjin wêje divê bi temamî kurdî be û yê ku dibêjin ne xem e bi zimanê din jî dibe, hene. Dîtina min navbera herduyan e. Bi ya min demeke dirêj wêjeya kurdî dê bi zimanê dagirkeran bê nivîsîn. Dema ku tîkoşîna bo rizgariyê bi pêş ve çû, dê zimanê kurdî hêdî hêdî xwe nişan bide. Zimanê kurdî nebûye zimanekî wêjeyî, bîngeheke neteweyî çênkerîye û bi firehî nehatiye qebûlîkirin. Ji sedî pîncê bêhtir kurd bi zimanê dagirkeran dipeyivin. Ev realîteyek e. Heke em bi zaravayê kurmançî binivîsîn, zazakîaxêf û soranîaxêf tînegêhin. Ev ji bo zaravayên din jî li dar e. Ji ber vê yekê divê em li zimanê neteweyî sor û germ bibin.

Zimanê neteweyî karekî pêvajoyî û demdirêj e. Bo nimûne, zimanê tirkî di dirêjahiya dîroka komarê de hîn nû hinekî dibe zimanê wêjeyê. Tirkên Anatoliyê tirkên özbek fêm nakin. Di nava zaravayên me de jî nêzîkî û hevbeşî heye. Lê di nav zimanên wan de ev tune ye. Ev pirsgirêk û problem jî bo neteweyên din jî pêk hatiye. Di nava farisan de jî ev pîrs heye. Dîsa erebên Sûriyeyê ji erebên Fasê cihê dipeyivin û ev tiştêkî ecêb û seyr nîn e. Kolonyalîzmê ev yek li welatê me bêhtir tahrîp kiriye.

Têbînî: Bi vê beşê nivîsa Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan a bi navê "Di şoreşê de wêje û rewşenbîr" bi dawî dibe.

Navenda Çanda Mezopotamya ya İzmirê

● 04.03.99 yekşem: Konferans:

"Pirşgirêka mirovê nû" Murat Akıncılar, saet: 17.00

● 09.03.99 în: Konferans:

"Çapemeniya muxalîf û sinca çapemeniyê"

Sami Tan (Azadiya Welat)

Devrim Kılıç (Rojnameger)

Evrîm Allî (Evrensel)

Pêşkêşvan: Kazım Aslan

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



YÇKM

● 03.03.99 şemî: Fîlmê Halit Refiğ "Qawîşa Jinan", saet:16.00

● 04.03.99 yekşem: Bi zimanê huner 'mirov û civak-8':Di sînemaya tirk de sansûr û qedexe, danîşana fîlm beşa yekem, saet: 15.00 Beksav

● 03.03.99 şemî: Fîlmê Steven Spielberg 'Salên Şirikî (Mor Yillar)', saet:15.00

● 04.03.99 duşem: Gotûbêj: Tiyatroya Hemdem-Ali Berktaş, saet:14.030 Fîlmê Costa gavras: "Çilgîn Şehir", saet:17.30

Rojî Şanoyî Cîhanî



Şanokaranî kurd legel hemû hêrîş û gureşî dujmin da netirsiyane û berdewam le hemû bûwarekanî pêşkewtinî jîyan de xebatiyan kirdine. Le wêney jor da Endamanî komî şano "Evîna Welat" debînrawe.

MEHDÎ CAHF

Hemû salek lem roje da şanokaranî dinya cejnî xoyan digêrin, ew şanokaranay ke her wek hunermendê gewre Panslafîskî niyet: Hunermend li her kû yek bin endamî xêzani xewre, belê endamanî em xêzana lê herçar kurneyîparzemîn em dinya bê binaedaletî û zilm zore da, lê dîr nêzik cejn digêrin.

Lê beyannameyî kongreyî şanoyî cîhanî ewa 28. 06.1948 li Şarî Prag bestra, biryar dira hemû salek li 27'î adar de bigrête Rojî Şanokaranî Cîhan. Salî par şanokaranî kurd li rêgeyî televizyonî Med ewa li bernameyekî taybetî de em rojîyan pîroz kird, be daxewa be planî turke rêgeştperste faşîstekan bi destî ewaneyî ke dibine girîng le pêşkewtinî şarîstaniyet û kulturî kurdî de girîng û rengî medyan lê girîfîn.

Şanokaranî kurd şan be şanî şoreşgeranî kurdî be karwanî rizgarîxwaz de û le şewezengî tarîkî de rêgeyî ronakiyan be mîlet nîşan dawê. Çendînan hunermendanî şano be guleyî faşîstekan şerîd kirawin wek şehîdan Berzan Osman, Erîwan Omer Dewlet, Hîwa Cahf, Musa Anter û Kerîm Osman, ew gelaney ke bindest û dengiyan girawe le rewî bizavî şano de le lûtkeyî dahênan û şerîrandin de bûn, çûnke le rêgeyî şanowe tûwanîwiyane êş û azar xwastekanî gel bixene rû. Deştîwanîm bêjim ke bi hunerî şano mirov dikare şoreş ber pa bikat û perde li ser hemû tawanekani dujminan labidet, le layekîtirewa ew gelaneyî ke le bûwarekanitirî jîyan de natewawiyîyan hebûbê le rêgeyî hunerî şanowa çareseriyîyan kirdûwa, her bo wê ye ke gotuyane: "Nanê ku şanowek im biderê ta gelekî jîrit bidemê."

Şano nîşaneyî pêşkewtinî şarîstaniyet û zanistî û


pêşrewî gelan e. Şano erkî serşanî mirovî şoreşgêr sîk û asan dike. Detiwanîn bêjin ke herdûkiyan yek deng in û be dî cûr le gerûyî pir le coşiyane dene derê w be gij hemû bergirekan de debînewew bo baxî radaweyî azadî û asayîş rêdiken.

Salî 1919 Ebdurehîmî Hekarî yekem kesek bû lê Kurdistanî gewre de ku bi zimanî şerînî kurdî şanoname binûset bilawî bikatewe, ewî şanonameyî Memî Alan û ku li kovara Jîn li Stambol belaw kirawe. Le payîzî 1921 de şanonameyî Selahedînî Eyûbî li şarê Hewlêr bi zimanê kurdî pêşkêş kirawe, li Silêmanî jî, sala 1926 yekemî grupî şano durîstbûw û çendan berhemî şanoyîyan pêşkêş kirdûwa. Di serdemî komarî Mahabad da jî, grupî şanoyê Kurdistan dirûst bû û şanonameyî "Şoreşa Ararat" û "Dayikî Niştîman" pêşkêş kirdibû. Her wiha lawanî kurd jî, li şarî Teflîsî Georgiyayê Yekîfî Sovyefî kon çendan şanonameyên kurdiyan pêşpêş kirdûwe le wana şanonameyî Qelen di sala 1928 de pêşkêş kirine di sala 1940'an de Musa Anterî Şehîd bi zimanê kurdî şanonameyî "Birîna Reş" belaw kirduwe. Şanokaranî kurd legel hemû hêrîş û gureşî dujmin da netirsiyane û berdewam li hemû bûwarekanî pêşkewtinî jîyan de xebatiyan kirdine, temaşekaran jî, hemîşe rêz û hurmetiyan le şanokaran nawa û layî xelkî xawanî rêz û xoşewîstî bûn.

Lew roje de şanokaranî kurd divê çî hest û şîurî wan hebê? Çon em cejna bigêrin? Le katek da ke dagirkeran û faşîstekan hereşe le bûnman û li welatman deken, telefizyona taqanekaman degriin û serokekî wek A. Ocalan eşkence dedin. Diba lem roje da ziyatir gurijim be xwe man bîdeyin û berhemî nû dabihênin.

TÎŞK

Îdam tûne



LERZAN JANDÎL

Îhsan Sabrî Çağlayngil vîradenanê xo de derheqe dardekerdena Sêy Rizayî û mahkeman de nivîsneno: "...tirkî nêzanitêne.... sebeta ke hakimî qesaya êxdamî nêvate û teyna qalê cezaya kîştne kerde qerar nêyame famkerdene. Pêrîne yew fêk ra dest kerd ci, vat e "îdam tûne".

Kurdê sera 1938'î tirkî nêzanitêne û ser de jî, nêşikiyêne ke xo biparêznê. La belê ewroj meydanê politîka de kurdî hem tirkî zananê û hem jî şîkîne xo zaf rind biparêznê.

Dawaya Serokê PKK'ê birêz Abdullah Öcalanî de ganî nê zanayenî rind bêre xebetnayene. Seba naye jî tanî çiyî ganî rind bêre zanayene.

Dewleta TC ye hîle û dekûdubare de zaf namdar a. Wunciya durî meşîme, vîradenanê Î. Sabrî Çağlayngilî de niyadîme.

Çağlayngilî nivîsneno: "Ma waştêne ke dadgeh qerarê xo amayena Atatürkî ra ver bidêro û tawo ke Atatürk amê wa meselaya Sêy Rizayî bêro guretene. Ma waştêneke mahkeme roja tîfî "şeme" bixebetîyo û wa qerarê dadgehî bêro ca. ...Ê jî Abdullah Paşayî-ato. "Qeraror corên êno testîqkerdene" û îmza eşta kaxita tale. Eke cor êxdamê Abdullah Paşayî bero nivsnayene, o bixor êno dardekerdene."

Naca yanê ewroj mesela na wa: Kurdî tirkî zananê. Şîkîno xo biparêznê kaleka nînan de ganî entrika dekûdubaranê TC ye ra, sîstem û politîkaya daye ra, dîroka daye ra hesab perskerdene. Ganî no hesab bêro perskerdene.

Guretena MED-TV yî şîn û şîwan kerd zaf çeyanê kurdan. Raştîye jî seke tim amêne vatene "bê MED-TV nameşe, bê MED-TV nêşono", bê MED-TVyî nêşono. Bê guman qerarê guretena televîzyonê kurdan qerarêde politîk o. TC ye avantajane dewletebiyene rind xebetnena û dinya de sere de Amerîka, Îsraîl û Ewropa jî waştananê TC ye seba menfaatanê xo ana ca. TC ye rind zana: Guretena televîzyonê kurdan kor, ker û lal kerdene kurdan a. Dêmede niya nazik de bê televîzyonî TC şîkîna rind astor bivazno, şarê xo tayê kesane nezenan manîpule bikero.

La belê hewese TC ye gula TC ye de mend. Şarê ma eroj şîkîno zaf çiyî bivirazo. Nê çiyî vîst sere naye ra ver mumkun nêbî. Nê ewroj mumkun ê.

Her kes hetê xo ra hem teyna hem jî ebi organîze hemverê nê kompoyan seba wayîrvejiyena birêz A. Öcalanî ganî her çî bikero.


Qewet û yewliya ma, hetkariya dostanê ma û şaranê bînan ma şîkînîme nê kompoyan tal vejîme, ere A.Öcalanî ganî her çî bikero.

Qewet û yewliya ma, hetkariya dostanê ma û şaranê bînan ma şîkînîme nê kompoyan tal vejîme, ere A.Öcalanî wayîr bivejîme.

Ewroj roja kurdanê rindan û xerabînan niya. Ewroj roje roja şarê ma, şarê kurdan e. Ganî her kurd, her kesê şarê Kurdistanî karê xo rind bikero. Eke nêkerd meşte bîro dîrokê nê kesane ef nêkena, ci ra hesab persena. Ganî ma hem nê hesabî ra hem jî vîjdanê xo ra û zanayena xo ra bitsîrîme

Çimke rayêde bîne çîna.

Çiroka şêr û rovî



Li daristana mezin hebû roviyek pir birçî û belengaz. Ji birçîna parxanê wî di hev re derbas dibû. Rojekê niv mirî diçe ba şêr. Jê re dibêje: "Tu

li birîna min bibe derman, ez ji birçîna dimirim."

Şêr dide pêşiya rovî, bi hev re diçin kêleka garaneke hespê berî. Şêr dizivire ser rovî û jê dipir-

se: "Çavên min sor bûne?"

Rovî dibêje: "Erê"

Şêr dîsa dibêje: "Pirça stûyê min gij bûye? Rovî dibêje: "Erê, wek şûjin rabûye."

Li ser vê yekê şêr dikeve nava garanê û hespeke xurt bê rih dave erdê, dikuje. Termê hespê davêje ber rovî. Rovî bê hiş dest bi xwarinê dike. Bêhna xwînê dikeve pozî, hiş li serî namîne.

Rovî ji ser term radibe, dikeve nava daristanê, di rê de leqayê kêrgokeke mêyî mecal dibe. Bangî kêrgo dike. Jê re dibêje:

– Were, tu pir belengaz û birçî xuyayî. Ezê te têr bikim.

Kêrgo tê ba rovî, herdu bi hev re diçin serê wê kerîya hespê berî. Rovî dizivire ser kêrgo, jê re wiha dibêje:

– Çavên min sor bûne? Kêrgo dibêje 'erê'.

– Damarên çavên min lê dixê Kêrgo dibêje; 'Erê'.

– Pirça stûyê min gij bûye? Kêrgo dibêje; 'erê, bûye mîna xencerê'.

Li ser vê yekê rovî qîran dide xwe û dikeve nava hespên berî. Lê çawa nêzî hespekî dibe, hesp zîtikek wer lêdixe, rovî di cih de rih dide, dibe tejane. Roviye bêaqil, xwe şêr dihesibîne. Ji xwe diçe. Nayê bîra wî dema ku birçî û belengaz bû.

Lê rovî tu car nabin şêr.

W. CENGO

TIŞTONÊK

Ker zirî, bişkul firî?

(Tifing)

Hanîkê manîkê,
Firşê derê kanîkê
Rê nade heywaneke

(Cemed)

Sofiko qûn devîko

(pivok)

Sê xwişkên te hene, bi pey

hev dikevin, nagihên hev

(perwane)

Du xwişkên te hene, li hev dimeyizînin

(tifik)

Xwişkeke te heye, her gavê xwelî li ser xwe dike

(bêjing)

Oda himhimî, tijî nanê genimî.

(Mêşa hingiv)

HERÊM: TORÎ

BERHEVKAR:

BÊRÎVAN ÜLGEN

MERHEBA JI WE RE

Pêşî em dibêjin cejna we ya derbasbûyî ya Newrozê û Cejna Qarbanê pîroz be û em hêvî dikin ku wekî hemû zarokên azad, hûn jî azad bibin û mafê xwe yî jiyaneke serbixwe bi dest bixin.

Hevalên hêja em dixwazin ka we di Cejna vejînê Newrozê de çî çalakî pêk anî, we cejna xwe çawa pîroz kir, bi name û wênayên xwe ji Azadiya Welat re bişînin da ku hûn û hevalên we yên din ji hev agahdar bibin û têkevin têkiliyan.

Bi hêviya rojên azad, heya careke din bimînin di xweşiyê de.

HEJMAROK

Qîz Xatûnê

Qîzê qîzê qîz Xatûnê

Bi şimika reqreqûnê

Porê xwe yê gulavdûnê

Rovî

Rovî rovî roviyê rindik

Serê dûvê rovî hemû

potik û kincik

Rovî çûye mala hesê

xala

Bar kir barê hişkê dara

Pirbizêk

Pirpizêk karî pizêk

Yek a min, yek a

Hemzê

Ya Hemzê kete çalê

Ya min ma beriya salê

Mele kar

Mele mele mele kar

Şev tarî ye diz hezar

Kê qayîşa seydayê min

xwar.

Silêmanê

Du nikul

Silêmanê du nikil

Çû serdarê tirkî kir

Hat xwarê çû gilî kir

Çû malê ji dê û bavê

xwe

Fedî kir.

BERHEVKAR:
GERNAS AVŞÎN

Ji Koma Çiya berhemeke nû: Venamire

Pişti berhema bi navê "Dilana bêsînor" demeke dirêj bû ku vê komê tu berhema (kaset û CD) nedabûn, lê van rojên dawîn berhemeke nû ya komê derket. Navê vê berheme "Venamire" ye. Di pêşgotina berheme de bi zimanekî wêjeyî têkiliyan berhemên komê wiha hatiye vegotin: "Meşê bi firêjan dest pê kir. "Rozerîn"ê firêjên xwe dan stranên me û em ketin "Dilana bêsînor" (...). Tîrêj bûn pêt û pêt bi agir gur bûn. Agir êdî "Venamire".

Koma Çiya yek ji temendirêjtirîn komên NÇM'ê ye. Stranên wê komê yên mîna "Berxwedan xweş doz e" di hemû çalakiyên girseyî de tên ser zimanan. Endamê komê Ali Temel, li çiyayê welêt ketiye nav refên pakrewanan.

Pişti berhema bi navê "Dilana bêsînor" demeke dirêj bû ku vê komê tu berhema (kaset û CD) nedabûn, lê van rojên dawîn berhemeke nû ya komê derket. Navê vê berheme "Venamire" ye. Di pêşgotina berheme de bi zimanekî wêjeyî têkiliyan berhemên komê wiha hatiye vegotin: "Meşê bi firêjan dest pê kir. "Rozerîn"ê firêjên xwe dan stranên me û em ketin "Dilana bêsînor" (...). Tîrêj bûn pêt û pêt bi agir gur bûn. Agir êdî "Venamire".

Di nava berhevoka stranên komê de digel gelek stranên gelêrî hinek stranên şoresgerî û sirûdên neteweyî jî cih girtiye. Stranên gelêrî ji herêmên mîna Cizîr, Çewlik û ji kurdên Anatoliya Navîn ji

hêla komê ve hatine berhevkerin.

Di berhevoka navborî de stranên du hunermendên şehîd jî cih girtiye. Strana "Jiyana Zindan" berhema endamê komê Ali Temel e û strana "Helebçe" jî berhema endamê Koma Amed Evdulmelek Şêx Bekir e.

Agirê di dilê wan de ku ew ber bi çiyayê welêt kişandine ji gotinên stranên wan jî diyar dibe. Bo nimûne, Ali Temel dibêje:

(...)

Dîwar didin pêş çavên me

Tarî dikin li zindanan

Kulmek ezmanê rengşînok

Pir dibînin ji bo hêşîran

Ev çandîya berxwedanê

Me ava kir bi mirinê

Her yek bimire hezar şîn tîn

Wek kulîlkên li ber biharê


Evdulmelek Şêx Bekir jî balê dikişîne ser birînên ku di dilê welêt de vebûne. Birînên Helebçe, Dêrsim, Zilan, Kermaşah, birînê Hewlêrê, Amûdê, Re-

wandûzê, Amedê. Ji gotinên wî jî tê fêmkirin ku êdî çiya gazî wî dikin:

Andok hey lo lo lo

Birîn û şewat im lo

Hemû stranên di berheme de bi şewazeke nûjen, lê bi giyanê kurdewarî hatine stîrîn. Stranên li gorî devoka wan hatine gotin, guhar tin di zimanê wan de nehatiye kirin. Helbest û newaya stranên ku ji hêla komê ve hatine çêkirin jî xweş li hev kiriyê. Lê bi tenê mirov vê yekê ji bo strana "Em dertên" nikare bibêje, ji bo ku helbest û newa li hev bînin hinek gotin tene daqurtandin û rêz û rêçikên rêzimanê tene pêşeskirin, lewre jî ziman şikestî dimîne. Ji bilî kurmançî di berheme de bi zaravayê kirdkî stranek û bi soranî jî stranekê



cih girtiye. Divê rexneyek jî li zimanê sorlîsta keç a komê bê girtin. Dema mirov baş guhê xwe didê, mirov tê derdixê ku gotinên stranê hatine jiberkirin û ew baş bi kurdî nizane.

SERWÎSA ÇANDÊ

Li ser romana kurdî panel hate lidarxistin

Ji roja Înstîtuya Kurdî li Stockholmê hatiye avakirin û vir de çend proje û armanç dane ber xwe. Yek ji wan projeyan jî nîqaşkirina romana kurdî bû. Heta niha li ser romana kurdî 10 civînên nîqaşê hatin lidarxistin. Gelek rewşenbîr, nivîskar, mamoste, şair û şexsiyetên kurd tevî wan nîqaşan bûn. Civînên ji mehekê carekê tene lidarxistin, di kasetan de tîn arşivkirin û di demeke nêzik de jî wê wekî pirtûk dekevin pêşberî xwendevanan.

Ligel nîqaşên li ser romana kurdî, li Înstîtuya Kurd semîner jî tîn lidarxistin. Heta niha ji aliyê şexsiyetên cuda ve gelek semîner hatin lidarxistin û gelek bikêr derbas bûn. Wekî mînak: Li ser globalîzm, bandora olê, li ser neteweya kurd, împaratoriyên Med û Mad, navgînên ragihandinê, bandora zimanên dagirkeran li ser kurdî û li ser nivîskarê kurd Selîm Berekat, çendek jî van semîneran in.

Armanca romannîqaşkirinê ew e ku, romana kurdî di nav romana cihanê de di kîjan qonaxê de wê were tespîtkirin, problemên romana kurdî werin dîtin û

ji bo çareseriyê wê hewl were dayîn

û ji bo qelîteya

romana kurdî

bilind

bibe; ci-

hekî rex-

negiriyê

w e r e

vekirin.

Yek ji

arman-

ca van

nîqaşan jî

ew e ku,

nivîskarên

kurd ji zanîn û

tecrûbeyê hev û

din îstifade bikin û

romanivîsên nû qezenc

bikin. Ya dawiyê jî, pêşxistina

ruhê neteweyî germahî û yekîtiya di

navbera şexsiyetên kurdan de.

Ji bo van armanç û hedefan, li Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê, ji mehekê carekê di nav kesên ji nivîsandinê hez di-

kin de nîqaş pêk tîn. Di nav wan de



kesên wekî Robîn

Rewşen, Serkan

B r û s k ,

M.E.Tuysuz,

X u r ş î t

Mîrzengî,

Hesênê

Alê, J.

Î h s a n

Espar,

Yusuf

Özden,

Fewaz

Hûsen,,

Y.Ebedî,

H e s e n ê

Metê û hwd.

hene. Di nîqaş û

panelên ku heta niha

hatine kirin de nîrxand-

inên gelekî heja û germ hatin ki-

rin û di kasetan de hate komkirin.

Li gori kesên nivîskar û birêvebirên

înstîtuyê, xwendevanên kurd dê ji van

nîqaşan îstifade bikin û bibin handar û

alîkar ji bo xurtbûna romana kurdî.

Heta niha li ser romana Erebe Şe-

mo, Xurşîd Mîrzengî, Mehmet Uzun, Hesênê Metê, Fawaz Husên, Rehîmê Qazî, Egîdê Xudo, Silêman Demir, Mustafa Aydoğan û hwd. hate rawestîn.

Di panela dawî de ku roja 26'ê adarê hate lidarxistin de jî, li ser biranînên Selîm Berekat ên bi navê Sî-sîrkên Hesînî-beşa yekemîn, nîqaş hatin kirin. Nivîskarê kurdî yê bi nav û deng Selîm Berekat, bi wergera pirtûka Ehmed Huseynî hate nîqaşkirin û li ser jiyana wî hate rawestîn.

Nîqaşên li ser romanê ku dom dikin, ji aliyekî de jî, nivîsarên heta niha qet nedihatî naskirin him bi xwendevanan, him jî bi nivîskaran dide nasandin.

Di avrêlê de "Evin û Şewat"

Li Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê li gorî biryara ku hate standin, di 23'yê meha avrêlê de dê li ser romana Sitkî Herîrî ya bi navê "Evin û Şewat" nîqaş pêk bê.

ŞORES REŞİ /STOCKHOLM

Di deh tiliyan de deh huner

Pîştî daxuyaniya Kıvrıkoğlu (Serfermandarê Artêşa Tirk) xeydok û sofik ji hev belav bûn û xebatên hilibjartinê lez girt. Êdî her der bi afîş, pankart û alên partiyên tê xem/ilandin. Di piraniya sloganên de siyaset nîn e. Lê dîsa jî afîşên her partiyê felsefê û helwesta wê diyar dike. Ji ber ku bajarê Stenbolê bajarê herî mezin ê Tirkîyeyê ye hemû partî giraniya xwe didin ser vî bajarî. Serokatiya Belediyeya vî bajarî bi qasî mebûstiya bajarekî din girîng tê dîtin. Lewre jî partiya Ecevit Wezîrê Maliyeyê wekî berendam nîşan da. Her partî bi rûçîkekî derdikeve pêşberî gel. Bo nimûne nûnerê CHP'yê bazirganekî li mezatê tîne bîra mirov. Li her derê destê derdikeve pêşberî mirov destê xwe dirêj kiriye, mirov dibêje, heke ew bi destê mirov bigire, dê destê mirov bihenciqîne.

Propagandaya herî komîk jî ji hêla partiya faşîst ve tê kirin. Berendamê vê partiyê dixwaze şarezatiya xwe ya di warê bajarnasiyê de nîşanî gel bide. Lewre jî di afîşê xwe klavyeya komputerê û rastkêşek (cetwel) kiriye bin çengê xwe. Li gorî agahiyê di afîşê de ew endazyarê bilind e, lê dîmena di a-



fişê de wî dixwe dilqê xwendekarekî dibistana seretayî. Lewre ew rastkêşa T bi kar tînin. Lê klavyeya komputerê tu wateya wê nîn e. Bo çî klavye kiriye bin çengê xwe mirov nizane. Lewre tu

kes klavyeyê bi xwe re nagerînin. Heke dixwest pîsporiya xwe nîşan bide dikarin bû komputerê serjinû bida ser jinûya xwe. Di propagandaya berendamê partiya faşîst de afîşê herî balkêş ne ev e,

dîmenekî ji wê balkêştir jî heye. Di afîşê navborî de ev slogan heye: "Di tiliyan de deh huner", xwediyê tiliyan jî her destê xwe rakirine nîşanî hilibjêrê dide. Di afîşê de hunerên berendamê partiya faşîst hatine rêzkirin. Mirov di zane ev hunerên wî çî rast in, lê hunerên partiya faşîst baş tene zanîn. Em dikarin hunerên wê partiyê bi kurte-helbestekê nîşan bidin.

Xelî melî çend tîlî

Tiliya beranê bo hestî hêranê
Tiliya şanîdanê bo kuştin lêdanê

Tiliya dirêj bo şerê qirêj
Tiliya gustîlkê bo xap û lîskê
Tiliya qîlîçkê bo çêjandina şîlûçkê

Tiliyên destê din
Tiliya mezin kuştin û dizin
Tiliya nîşanê karên wehşane
Tiliya navîn kuştin û revîn
Tiliya babelîçkê bo êrîş û lînçê
Tiliya biçûk bo teriya kûçik.

NERMEND TILÎTÛ

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (166) XAÇEPIRSA

Bi serokatiya Serfermandarê Nermend	G	Qewlekek Xirabkar	B	Cerem Bi kirdkî ev	H	Pasqala Nevdîran ev	T	Tevgera herwayê Dewletê Rî Kan	B	Bi serokatiya Nermend	
	Z	E	K	I	Y	E	Â	L	K	A	N
Cinavkek Alavên gewartarê	W	E	Wîr, qasî Gênerêl	A	S	T	A	N	Bi serokatiya Ev	I	
	A	R	D	Û	Diget hev Gelo	T	E	V	Cinavkek Pîlîman nawîyan	E	?
Yordakî Sembola Hêzdar	E	K	Cinavkek Wargîrê hêrî	M	E	Roverê guman Hêrtar	E	S	M	A	
H	Kandî Hawer	A	Z	A	Tîpa yekemîn Pîşgîrî	A	Diguliyên bi Dîpîrîyê kurdî	S	E	R	
Din Sertîyên kîmetir	Î	R	O	Herçê kîmetir	E	Z	A				
K	M	Ewger bi gîrî Nîvîyê	Z	Û	R	Î	N				
Felaket Wî kurdî vî	A	F	A	T	Notayek	M	?				
Î	N	A	N	Minçîrîya Nîvîyê	P	E	N				

Cureyeki mar	Qulqulî Nişandayî n	Ev car Sembola rûbîdyûm ê	Cinavkek Ezezî	Paçik carinan	Gels, zêr
Şehîdek (Wêne)				6	1
Şervanê berê Rojek				Bi kirdkî ev Çiya	
	4		Gir Kuliçe, çorek	Cinavkek Sembola Rodyûmê	
Gelo Zanîst		Tîpa berî 'L'yê	Pê masî tên girtin Notayek		Tipeke kurdî
				Quwet Bi soranî Tirêj	3
Dengdarê n "rade"yê Sembola oksijenê		Cureyeki rastkêşan Tayê ji hîriyê	Pêşgireke îngilîzî		
	Bi rast- nivîsa îngilîzî Îde		Ling		
Bere vexwarina bingehin		5	...î ala	2	
		Pêşeng			


Bersiva Xaçepirsa 164'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binirxînin û bi riya peşkê li 5 kesên belav bikin. Xelata hejmarê me ya 166'an, Kaseta Koma Çiya 'Venamîre' ye.


Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên xelata hejmarê 164'an; "Dağlarımda Öldür Beni" qezenc kirine: Sami Algemi /Manisa, Kasım Erçelik /Meletî, Nezîr Erdemci /Stenbol, Bengî Bengî /Meletî, Şoreş Evîndar /Enqere



BÊJING



MEM KAYA

IMRALÎ RA XEBER ESTA

Öcalanî ra mesaja roşanî

MEMED DREWŞ

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî roşanê qurbanê alemê îslamî pîroz kerd û wast ke roşanê qurbanî bibo wesîleyê rojanê azad û bingehê birayin û pêdustinê meştê ê şarê ma.

Abûkatanê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî ra Mahmut Şakar, Ercan Kanar, Hasip Kaplan û Mükrim Tepe rojo îne (26.03.1999) şiyê Çarawê îmralî û Öcalanî ya pêdiyin viraşt. Öcalanî raya abûkatanê xoya munasebetê roşanê qurbanîya jew eşkerakerdin viraşt. Öcalanî eşkerakerdin de roşanê qurbanê alemê îslamî pîroz kerd û wast ke roşanê qurbanî bibo wesîleyê rojanê azad û bingehê aşti, birayin û pêdustinê meştê ê şarê kurd û tirk. Öcalan eşkerakerdini de nê qalan ser ro vindarto:

a-Çoşmeyê Jûwina welatî û xoserîna dewlet de çareserkerdino demokratîk û aştiyane esas o.

b-Dewlet ke biwazo çoşmeyê protokolê adirbimayinê peyini de raya aşti û birayin abiyena.

c-Qandê nînan qanûno ke bişo haqê tewrbiyinê siyasi bido kesan hêdîre bo.

d-Cewherê çareserkerdenê sivil û siyasi tewrbiyinê kurdanê demokrat û siyasiyan o. No yeno mahnaya çareserkerdini demokratîk.

e-Akerdini kampanyaya aşti û efû

esas bigeyriyo, na kampanya ser ro zere û tever de vindêriyo.

f-Wa ziwanê medya aşti û birayin rê xizmet bikiro.

Öcalanî dewam ra wina vato: "Na xeta aştiya ke ma qandê çareserkerdina meseleya kurd akerda, aya verniya Tirkîye akiro û bibo sebebê raveşiyayinê ci".

Wexto ke no eşkerakerdini Öcalanî kewt ma dest, ma tahmîn kerd ke medyaya tirk ca bido nê eşkerakerdini. Feqet rojê didin ma ewnaymi medyaya tirk cadê nê qalan de, ca diyayo çinayo ke abûkatanê Öcalanî giroto û berdo ci rê sero vindartê û nûsto ke abûkatan çina nêzan kamîn maxaza ra giroto û zey nînan.

Tabî a seat de kombiyayino ke 25'ê meng reşemî de abûkatanê Öcalanî ra A. Zeki Okçuoğlu muzexaneyê çapemenî de viraştibi ame mi virî. O wext ma wastê ke rewşê Öcalanî bimûsim, coka ma rewşê Öcalanî sero vindartê, rojnamegeranê xerîban û çend demokratana piya. Feqet, ê çinayê Öcalanî sero vindartê. Tabî ma xo vira kerd pers bikim, bibo ke ê mûxabîrê magazîni bî?

Mûxabîrê magazîni jî mecbûr ê ke çiyane magazînan sero vindirê. Xora abûkatê Öcalanî yê jî, na mesel sero e-cizyayina xo anê ziwan û vanê ke, ze ke mûxabîrê bîni memanê rojnamey û televizyonê tirkanê rewşê Öcalanî teqîpkerdin danê mûxabîranê magazîni.

WA KES PKK ZEY VERÎ MEHESIBNO

Serdaranê dewleta tirk, medya û nûstoxanê ci Kenya ra Tirkîye remnayinê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî zey qediyayinê serhewadayinê 29'inê kurdan hesabna û fikiray ke ê rojî, yanê 15'ê menga reşemî roşanê qedînayinê kurdan îlan bikirê û ê rojî zey roşanî pîroz bikirê.

Înan da yê kotî ra bizanayê kurdê na wisten ci qirik de biternê. Ezo bawer kena eke serdaranê dewlet bizanayê oyo wina bibo, înan Öcalan nêardê Tirkîye.

Amerîka Öcalan teslîmê Tirkîye kerd û înan jî girot, ard Tirkîye. Feqet bêre ewro bewnê ke Tirkîye Öcalanî ya belayê dekewta. Tirkîye ardinê Öcalanî peyra her roj çend cayan de molotof û bombeyê teqenê, wesayit û dukanê veşenê.

Bi taybetî Tirkîye ardinê Öcalanî peyra, cenî û camêrd, qij û pîl, pîr û xort, laj û keyna, yanê, her neferê şarê kurd, xo zey heyf-girotoxê Öcalanî hesabna. Qandê heyfê Öcalanî girotin ci dest ra, çiçiyoyeno iyê kenê. Nînan miyan de, winî heveyê estîbi ke, nêzanayê xorê melemen bipewjo û pîzeyê xo mird bikiro. Feqet bêre ewro bewnê, êkê verê 15'ê menga şibat nêzanayê melemen bepewjo û pîzeyê xo mird bikiro, ewro biyo viraştoxê molotofan.

Goreyê vatenanê fermanaranê ARGK û xortanê kurdan, iyê karê remnayinê hewnanê serdaranê dewleta tirk bêrabend dewam bikirê. Xora fermanaranê ARGK ra Osman Öcalan verdê racenayina MED-TV, raya telefoniya tewrê jew panelê MED TV bi û o jî rojê 15'menga şibat ser ro vindart-bi û o roj zey mîlad nîşan dabi û wina vatibi: "Wa dost û dişmen nay rind bizano. Ma yê 15'ê meng, zey mîlad vînemî. Hinî, niwa tepya, wa her kes, wexto ke hesab virazenê, lazimo ke hesabê xo zey verê 15'ê meng û badê 15'ê meng virazo. Wa qe kes ma zey

verê 15'ê meng mehesibno û gama xo jî zey verî meçikiro. Ma hetanî 15'ê meng goreyê wastena serok Apoy nêşa pêrodîm. Feqet 15'ê meng ra tepiya her gerîlayê ARGK, fermanarê ARGK, û nînan piya jî her neferê şarê kurd o, tarz û ruhê pirodayinê serok Apoya şer bikiro û bibo şerwanê serok Apoy. Fermanarê ARGK Osman Öcalan dazanayin ke, iyê ewro ra tepiya keverê kesî piro medê û kesî ra aşti û azadiya xo mewazê. İyê haqanê xo pirodayina bigirê û kesî ra azadî û aşti parse mekirê. Fermanarê ARGK vat ke, iyê niwa tepiya serdaranê dewleta tirk jî hedef bigirê û iyê serdaranê dewlet keyanê ci de rahat merafinê û hewnanê ci bireminê.

Osman Öcalanî eynî program de qiseyê xo wina dewam kerdî: "Mayê şerî gur bikim û wayiranê nê kompoy ra hesab pers bikim. Wayirê nê kompoyê bêre linganê ma ra pîrêskiyê, feqet ma yê înan af mekim. Ma yê haqanê xo, pirodayina xo dest finnim".

Bi rastî jî, çend rojan miyan de nê vatenê fermanarê ARGK amey ca. Şer nika ra kirêşya metropolan. Her roj çend cayan molotof û bombeyê teqenê, hewnê serdaranê dewlet remenê. Bombe ke kewt dest bombana, bombe ke nêdi molotofana iyê kerdenanê xo vêşî bikirê.

Ancî şarê kurd badê 15'ê meng her kişta dinyay de weriştî pay û payweriştinê kurdano ewro her ca yê dinyay de vêşibiyayina dewam keno. Şarê dinyay payweriştinê şarê Vietnam û dostanê ci peyra hetanî nika payweriştino wina hera û derg nêdi û iyê nêvinê. Hetanî şarê kurd haqanê xo, xo dest mefino oyo wayiranê leteykerdoranê Kurdistanî rahat mevirado (meterno) û destê ci do qirikda wayiranê leteykerdoran de bo.

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)

245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerîndeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)

M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NİVİŞGEHÊN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)

■ Amed:

Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mêrsîn

Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmir

Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

■ Edene

Tel: 0 (322) 351 42 78

■ (Nûnerê Giştî yê Ewropayê)

Mahmut Gergerli

Tel: 49 871 672 29

Fax: 49 871 670 815

■ Swîsre:

Ihsan Kurt

Tel-fax

41 21 652 76 07

■ Fransa:

M. Ali Doğan

Tel- 33 614 32 43 55

■ Belçika

I. Can

Tel: 32 53 64 12 41

■ Hollanda:

S. A. Fewzi

Tel-Fax: 31 10 48 555 43

■ Almanyaya:

Fener Rojbiyanî

Tel: 49 228 92 51 284

■ Suriye:

Jana Seyda
Helim Yûsiv

Rojava Cîhan û GAP



Wekî her welatê mêtîngeh, li welatê me jî mêtînger dewlemendiyê me didizin, talan dikin. Mêtînger projeyên sektorên din jî bo asîmîlekirina me bi kar fînin. Berê kevne-serokwezîra dewleta tirk Çiller, piştî serokomarê tirk Demirel digotin: Divê ava Çemê Feratê biherike Deşta Konyayê. Mixabin ev daxwaza wan îro tê bicihanîn.

Li gorî nîsbeta pêkhatina GAP (Projeya Başûrê Rojhilatê Anatoliyê) ê, heya îro çi pêk hatiye? Armanca û hedefên GAP'ê êdî zelal û berbiçav bûne? Aliyê navneteweyî yê GAP'ê tiştê berbiçav e? Bersiva min belê ye. Êdî mijan li ser GAP'ê hêdî hêdî belav bûye. Piştî amadekirina deh salan plana master a GAP'ê armanca û daxwazên dewletê roj bi roj eşkere dibin.

Armanca destpêkê ya GAP'ê; avdan, enerjî û peydakirina ava vexwarinê bo bajarên mezin bû. Wekî tê zanîn jiyana aborî, siyasî û civakî bandorê li hev û din dikin. Sektorên çandinî, enerjî, ragihandin, madenkarî, hilberîn, tûrîzm, avahî, perwerdehî, tenduristî û xizmetên gelemperî yên din jî li ser vê bîngehê bandorê li hev dikin.

Emê pêşî li danêrên rêveberiya îdareya pêşveçûna herêma GAP'ê ya tîrmeha 1998 binêrin. Maliyeta berhevkirinê 32 milyar dolar e. Heya dawîya sala 1997'an, 12.6 milyar dolar lê hatiye xercîkirin. Rêjeya pêkhatina nakdî % 41.3 ye.

Sektorên li gorî pêkhatina nakdî weha bûne: Sektora çandiniyê %10.9 e, sektora enerjîyê % 72.7 e, sektorê madenkarîyê jî % 93.6 pêk hatiye

Bi li danêrên jorîn jî em dibînin ku, projeyên ku armanca wan enerjî ye yan jî madenkarî ye temam bûne an jî çêkirina wan didome.

Xebata projeya avdanê a herî mezin li Deşta Heranê ye. Ev proje jî nivco amade bûye. Projeya valakirinê temam nîn e, avên avdanê drenaj nabin. Ji niha ve gelek erd şorax bûne û li derveyî çandiniyê mane.

Projeyên enerjîyê û madenkarîyê bi piranî temam bûne. Wekî her welatê mêtîngeh, li welatê me jî mêtînger çavkaniyên me didizin, talan dikin. Mêtînger projeyên sektorên din jî bo asîmîlekirina me bi kar fînin.

Berê kevneserokwezîra dewleta tirk Çiller, piştî serokomarê tirk Demirel digot, kesî bawer nedikir. Lê mixabin îro jî



daxwaza wan ketiye bernameya Saziya Plankirina Dewletê da ku ava Çemê Feratê biherikin Deşta Konyayê.

Çawa ku erdên Serêkaniyê pêşkeşî pênaberên Afganîstanê kirin, ji kesî deng derneket, îro jî daxwazîna ku Çewlika Hilberandinê Dewleta (devlet Üretme Çiftliği) ê, arizî bikin.

Ez îdîa dikim, çawa ku di dîrokê de şerên li Rojhilata Navîn bi piranî, ji ber bikaranîna avê derketibin, îro jî di komploya ku li dijî Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan hatiye lidarxistin de jî, di têkiliya Sûriyê û Îsraîl û Amerîkayê de jî para ava Feratê, gelek e.

Mînakê balkêş jî peydakirina ava vexwarinê ye. Yek ji armancên GAP'ê jî, ji bo bajarên Amed, Riha û Dîlokê di salê de peydakirina 256 milyon metrekûp ava vexwarin û bikaranînê ye.

Roja 22'yê adara sala 1999'an ji bo Roja Ava Cîhanê, li Rihayê li salona konferansê ya DSI'yê panela "Li Rihaya ku bi pêş dikeve ava Vexwarinê" (Gelişen Ş. Urfa'da İçme suyu) hate lidarxistin.

Serokê belediyeya Rihayê Ahmet Bahçıvan di axaftina xwe de da zanîn ku; bo kesekî 200 lîter av/roj bes tê pejirandin. Lê kesên ku li bajarê Rihayê dijîyin, encax 80 lîter av diqedandin. Ava vexwarinê ya bajêr jî 17 heb bîrên binerd (A-

BEYAS) peyda dibin. Wan jî bi giştî du bîr bi kan anîne. Yanê ji 15 bîran ava hemû bajêr peyda dibe.

Serjimara şeniyê navenda bajêr îro 500 hezar e. Her sal 40.000 kes lê zêde dibe. Li 57 heb taxên bajêr di rojê de nêzîkî niv seatê av diherike. Elektrîkên bajêr jî her tim jê tene birîn. Ev yek jî problemê zêde dike. Tora avê jî sala 1935'an de hatiye raxistin. Ji ber vê sedemê jî nivê ava şebekeyê wînda dibe; ava vexwarin û kanalizasyonê tev li hev dibe. Di encama wê de jî nexweşiyên perok sal bi sal zêde dibin.

Rayedarên DSI'yê jî dibêjin, "17 bîrên ku DSI'yê çêkirine di sala 1995'an de me dewrî belediyeyê kirine." Li salê 2326 milyon metrekûp ava vexwarê didine navenda Rihayê. Niha jî em dixebitîn ku ava Bendava "Bavê Reş" bigihînin ber devê derketinê Tûnelê Rihayê ya duyemîn da ku dezgehê dawerandinê çêbikin. Dezgehê dawerandinê divê di 20.11.2000'an de kuta bibe, lê diravdanî (tesîsat) tune ye, ji ber vê dibe ku dereng bimîne. Projeya xetên ragihandinê ya makî, stasyonên pompe û depoyan amade ye, di demeke kurt de wê îhale bibin. Dema ku proje biçe serî, emê bikaribînin her roj 300.000 metrekûp av, her sal jî 99 milyon metrekûp av bidin bajêr.

Yanê li gorî gotinên rayedarên, divê

çêkirina tûnela duyemîn (T2), çêkirina dezgeha dawerandinê, îhaleya şebekeya ragihandinê û şebekeya belavkirinê biçe serî û piştî jî ew hemû dezgeh temam bibe û ava pak û zêde bidine Bajare Rihayê.

Diyar e ku, ev proje herî kêr dê di dehsalan de encax bi dawî bibe. Nexweşiyên mîna hal (tifo), dîzenterî, qolera, (kulemar), dê sal bi sal zêde û belav bibin.

Madem wiha ye, rayedarên tirk û serokê belediyeyê çima ewqas pesnê GAP'ê didin û dinepixin. Heke insanên me yên ku li "paytexta GAP"ê (rayedarên tirk wisa dibêjin) dijîn, ji ber tîbûn, ji ber bêaviyê nexweş bikevin, heta niha we ji me re çi xizmet kiriye. Em niha baştir dizanin ku hûn bi riya GAP'ê çavkaniyên me yên sererd û binerd didizin û dişêlînin.

Hûn bendavên Keban, Zinarê Reş, Bavê Reş û hwd, bi vê sedemê çêdikin. Îsal ji ber birîna elektrîkê pembûyên cotkarên Wêranşehrê zera der dibînin, cih bi cih ji ber bêaviyê hişk dibin. Lê elektrîka Herêmê Marmarayê qet qut nabin.

Êdî hûn nikarin me bixapînin. Ev pîrgîrêk bi girîn, axîn, fixan û lavayên Bahçıvan çareser nabin. Divê gel hişyar bibe û xwedî li nîrxên xwe derbîkeve.

ÇIL KAN